

# Omitê Mistefê

## Tizbiya 33 moriyî

-dîwançeya helbestvanekî dilciwan  
li hêwana pîremêrên teqawitbûyî  
ji bêdengiyê-



2023



## **Naverok**

- 1. Vê berêvarê helbestekê ez hişyar kirim**
- 2. Îşev helbestekê ez nivandim**
- 3. Şîretê li gelê xwe dikim bi moçikên cînaran**
- 4. Ji vê dûrketina bêrewişt pir daxnaxî me**
- 5. Sûc û ceza**
- 6. Merasima dewrkirina text û tacê**
- 7. Bexşîşa straneke te ye stûyê min**
- 8. Dîsan dor nehate Kurdo!**
- 9. Kurtikên havînî yên milqol**
- 10. Du stranên evînî û yeke mêrxasiyê**
- 11. Strana şehîd Kenanê Elî**
- 12. Êdî tu jî bi şîrê xwe**
- 13. Tenê**
- 14. Ne bi qestîka, lê bi rastîka!**
- 15. Bi şîretên şîretdarên dilorînim vê helbestê**
- 16. Nixamtin, kod û krîpto**
- 17. Senaryoya fîmekê**
- 18. Şevnameya biyanistanekê**
- 19. Strana xwedêjêrazî Gavanê Kurd**
- 20. Strana xwedêjêrazî Meymûnê Gavên**
- 21. Helbesta tevlihev a Apê Cihangîr**
- 22. Çi me ez? (werger ji Dr. Eliyê Şerîetî)**
- 23. Lavahiya kurdekî**
- 24. Straneke rexneyî ji bo siltan Silhedînê Eyûbî**
- 25. Xwedê xêr ke dîsan!**
- 26. Ax pişta min!**
- 27. Îro piçekê pak im**
- 28. Bi Zembîlfiroşî re pêşbirk nabe!**
- 29. Payîz mêvana zivistanê**
- 30. Sozê me payîz bû û ez nehatim Selwa**
- 31. Jimaryarê payîzê**
- 32. Pênc bingehên dilşadiyê**
- 33. Felsefeya jiyane (werger ji Îlya Ebû Madî)**



## 1. Vê berêvarê helbestekê ez hişyar kirim

Vê berêvarê helbestekê ez hişyar kirim  
ji kurtexeweke piştî karê rojane,  
rabûme ser xwe  
û min aveke hênîk reşande serçavên xwe.  
Nizanim çima, lê mîna berxekî mîjo  
reviyame ber hingilê înternetê.  
Nizanim çima,  
lê xwendinê bala min nekêşa,  
dema ku gotindarê vîdyoyekê diaxivî li ser siyasetê.  
Mêrikê zana û pispor digot:  
*"Siyasetmedar, belê belê siyasetmedar...  
Her kes û nekes ji wan tengezar e;  
her dev û her ziman  
gazinan dike ji wan,  
her kes dibêje ku siyasetmedar gendelxur in.  
Gelo gazindar mafdar û xemxur in?  
Ez ne bawer im.  
Ma ev siyasetmedar ji ku tên?  
Ne ji esmanan dadikevin bi zembîl û sîwananan;  
ne jî wekî matrîksên xeyalî  
ji gerdûn û gerestêrkên dûr tên şandin.  
Tevahiya wan encameke zayendî ya dê û bavekî ne,  
ango bingeha wan malbatek ji malbatên me ye;  
li dibistaneke me xwendiyê,  
li dêr û mizgefteke me dua kiriye,  
li kargeheke me xebitiye,  
li zanîngeh an jî akademiyeke me ya leşkerî perwerde bûye  
ji aliyê welatîyên me ve hatiye hîlbijartin  
û ji aliyê saziyên me ve hatiye erkdarkirin.  
Diyar e ku rewşa pergala me ev e,  
karê me yî herî baş ê nimûneyî ev e,  
tiştê ku hêza me digihêjê ev e.  
Ev e pergala ku ji xamê me berheman hildiberîne,  
me ev pergal layiqî xamê xwe dîtîye,  
ew bi zor û zehmetiyê saz kiriye,  
li ser nefîs, malbat û civaka xwe ferz kiriye,  
nirxê ku me daye xamê xwe ev e  
û me bi destên xwe jê re durist kiriye ev pergal.  
Her kes ji vê rewşê jî gazindar e;  
dibêjin xamê me zêr û zeber e,  
dikeve nav çop û gilêşa civaka feramûşbûyî  
pergala zengarî ya li ser vê civakê ferz kirî jî  
wan nifşên xam û bêguneh dihêre  
û diavêje ser sergoyên mişextî.  
Gelî camêr û canikan!  
Heke hemwelatîyên we xweperest û nezan bin,*

serek û berekên welatê we jî  
dê xweperest û nezan bin.  
Şert û merc naguherin  
û bi tu awayî baştir nabin.  
Em tenê nezanî û xweperestiya xwe  
nifş bi nifş vediguhêzin.  
Belkî ne tenê siyasetmedar riswa ne;  
dibe ku gel bi xwe jî riswa be.  
Belê, êdî bi wêrekî bibêjin  
gel bi xwe jî riswa ye."

Piştî temaşe û guhdariyê,  
min maf neda vê mafdariyê  
û min gote xwe:  
"Ev î ne kurd e,  
zimanê wî ne kurdî ye  
û welatê wî ne Kurdistan e.  
Ev î serxweşê xwendin û hizirînê ye,  
ev î dilxweşê hînkirin û şîretê ye,  
û nizane ku li deverine welatê min  
xwarina min tenê mirtoxe  
û nasnameya min qedexe ye;  
nizane ku zimanê min hişkegilêkirî ye  
li ber nalîn, gilî û gazinan,  
li ber karmend, rayedar û serbazan,  
li ber dadgeh, dozger û zebaniyên zindanan.  
Her wiha ev î ne kurd e,  
xîretkêşên kurd nas nake  
û nizane ku kurd bi cizbeya xwendinê nakevin,  
li ber bayê hizirînê bi taya <fermo ezbenî>yê nakevin,  
dilên xwe tenê bi hînbûna dadweriyê xweş dikin  
dilên xwe tenê bi hînkirina azadiyê serxweş dikin."  
Min gote xwe, gote hişê xwe û gote dilê xwe;  
heta ku helbesta min qulozî dîwana wêjeyê bû,  
û nişîvî ber çongên min qelema reş û deftera çîlspî.

19.05.2023; 21:01  
Buxarest, Romanya



## 2. Îşev helbestekê ez nivandim

Ez ê binivîma, lê xew li min bûbû kew;  
dabeliyam ser taximê sîng û berên înternetê lew.  
Min gote hişê xwe ku mijarekê bihizire,  
hizrê bi ser hev de bîne  
û piştî keys-gurûsê  
encameke beraqil jê derîne.  
Di wê navberê de

reklamek hilpekiya ber çavên min ên bêberçavk  
mîna bêhêviyê ku xwe diavêje ber şemendiferekê  
da ku rizgar bibe ji bêhuzûriya dil û mêjiyê xwe.

Gotindarê vîdyoyekê bi zimanekî biyanî digot:  
*"Barê mirovî çî be, wê vediguhêze ba te;  
heke piştîyê wî cihê şermê be,  
dê te şermezar bike û bide şermê.  
Heke di barê wî de tişteki bêqîmet hebe, dê nîrxê te jî bixîne;  
û heke çavtêr nebe, dê te rexne bike  
mîna parsekê ku gazinan ji tengasiyê dike  
û li pey xwediyê xêrê ava pesnê ro dike.*

*Heke hêrshatî, engirî, tehlijî yan jî tengijî be  
dikare te tawanbar bike li ser tişteki tunejî  
da ku enîşkekê li newqa te bixe  
û neksa te biçikîne bi derbeke kêmfirsendane.  
Heke tûrikê wî vala be ji hêjahiyân,  
dê te biçûk bibîne yan jî biçûk bixîne;  
kesê mereqdar û heweskar  
geh komekiyê dide xwediyê xeyalan  
geh piştgiriya dide rêwiya deverên nenas.*

*Heke evîndar be, dê hezkirinê biniçîne te  
neqşên herî bedew raçîne ser tevna te,  
û rizamendiyê nîşan bide li cefayê  
da ku bigihêje çavkaniya wefayê.  
Bi kurtasî, lê ne bi kutasî:  
kî çî bide te, ji çavkaniya dil-hinavên xwe dide te  
çî ji te wergire, bi rizamendiya vîn û biryara te dibe."*

19.05.2023; 23:15  
Buxarest, Romanya.



### 3. Şîretê li gelê xwe dikim bi moçikên cînanan

Ev çendî çend sal e nizamim,  
hertim hîn dikim çanda resen a kurdan;  
lê qenc û pak dizanim  
ku kê kes nîrx û erzişê didin mîrateya bav û kalan.

Moçika min a vê carê  
şîretên dinyadîtiyekî afrîqînîjad e;  
camêr bi dengekî zîz diqîriya ser guhdaran  
û han dida hizirînê:  
*"Gelî guhdaran,  
kêçek bi qasî nod santêmî dikare banz de;*

*lê gava hûn vê kêçê biavêjin şûşeyekê  
û devê wê bi devîkekî bigirin,  
ew ê dîsa hewl bide ku bi qasî karîna xwe hilpeke.  
Her cara ku hilpeke û banz de,  
devîkê şûşeyê mîna rêbirekî  
nahêle ku bi qasî hêz û qewareya xwe banz de,  
loma ew ê êdî hêvîşikestî be.  
Piştî ew ê banzdana xwe li gorî derfetên heyî bipîve,  
ango ew ê bi qasî mesafeya sînorkirî hilpengize;  
wisan e, sedem û delîveyên li ser dorhêlê sepandî  
hêz û şiyanan kêr dikin, berbest dikin.  
Wihareng e, gava têjîkên vê kêçê çêdibin,  
dibînin ku banzdana maka wan heta arîkê şûşeyê ye  
ango fira mirîşkê heta ber devê kadînê ye;  
lewre ew jî maka xwe moçik digirin,  
hêz û şiyana kêçê ya nod santêmî naceribînin  
û tevgera maka xwe mîrate dihêlin  
ji nîfşên li pey xwe re.  
Îcar heta ku devîkê şûşeyê neyê vekirin  
hêz û şiyana kêçan a rastîn  
nagihêje lûtkeya rajorîn;  
bi vî awayî em digihêjin vê encamê:  
heta şert û mercên jiyane neyên duristkirin,  
derfetên serkeftinê nekevin destê civakê  
û sînoren sepandî yên qudûmşîkên neyên çirandin  
mirov nagihêje lûtkeya hêz û şiyane xwe.”*

*Ez jî guhdarekî vî camêrî bûm  
bêyî ku bizanibim  
bê ka li ser kîjan dîn û baweriyê ye  
û li ser kîjan xisletên camêriyê ye;  
lê min şîreta wî hilda û wergerand  
li berîka wêjeya kurdî dagerand.  
Hêvîdar im ku kurd  
muhtacî vê şîretê nebin,  
nekevin tengasiya hizirîne  
nexapin bi şûşeyên şefaf  
û dorhêla xwe venegerînin zindana melisîne.  
Her wiha tika ye ji kurdan,  
bendê Xwedê hişkehişk bigirin,  
nepejirînin sînoren bendeyan,  
gava li hespî siwar bûn Xwedê ji bîr nekin  
û gava peya bûn jî  
hespî ji bîr nekin tu carî.*

*31.05.2023; 16:51  
Buxarest, Romanya*



#### 4. Ji vê dûrketina bêrewîşt pir daxnaxî me

Di berbanga sibeheke payîzê de  
çavxumariya min ji xewa şîrîn rabû;  
hanzûka aveke hênîk li rûyê xwe yê nazenîn reşand,  
cil û bergên derveyîn li xwe arastin,  
û derfet nedît ku taştêyekê amade bike,  
loma ji bo xurîniya me du kade kirîn li devê kolanê.

*"Kambaxa wasiteyê çima dereng ket?  
Xwedê nekirî tişteki nebixêr qewimî gelo?"*  
digot di dilê xwe yê kelogirî de.  
Lewre dema ku ez peya bûm ji erebeyê  
û li bin dareke sîdar rawestiyam,  
pêşiyê çavên wê yên zeytûnî biriqîn,  
piştîrê lêvên wê yên hinarî bişirîn  
û ji ber kelecaneke nehesabkirî  
destê wê yê rastê hejijî bi wateya xêrhatinê.

Gava em li pêşberî hev rawestiyan  
û bîbikên her çar çavên me hev ramûsan,  
em ji tirsî re qîban bervemal bûn li wê biyanistanê;  
gava em gihîştin ber derê malbavana dilnarînê,  
min pî kuta erdê û bi pîbarî got:  
*"Edeta min e, bêkebîn nakevim hundir!"*  
Demildest hinarikên rûyê wê  
vegeriyan xaşxaşkên besta Makûyê  
û bersiv da bi lêvên rikrikî:  
*"Wisan e, tu bisekine li vir  
heta ku pertalên te li pişt dêrî xim  
û em ê piştîrê bigerin li kuçeyên taxê  
heta ku nûçeya hatina te bigihêje malxwê."*

Berêvarê em dageriyan mala şênbûyî bi şênîyan  
û bi tarîbanê re rûniştin ser destexana şîv û şîrînahîyan;  
piştî xwarinê em derketin şaneşîna hewadar,  
gava bayê başûrî dida porê wê  
û çend têlan rûyê min dialast,  
helbesteke dildariyê dinepixî li fêza ewrên çavnebar,  
lê hemû stêrkên esmên şahidên me bûn  
ku ez û rûheyva xwe li pêşberî hev diçirûsîn.  
Her çi çaxa ku diranên wê yên mircanî bi kenekî durist diteyisîn,  
dilê min î heyran bi bilqanên derûnî hilditeqilî  
û reh û masûlkeyên min bi şoreşeke evînî dihesîn.  
Ji bo serkutkirina pêlên berxwedana min  
artêşeke giran ajote ser mêjiyê min î req  
wê xwepêşandêra vînhesin;  
lê min nêrînen xwe yên sîxurî  
li nava porê wê yê şîrdankî veşartin  
û daxwaza lêvên xwe yên ji kerban hilpingirî  
gihande gêlaseke terixî li ser zimanê wê yê gevez  
berî ku ziyar bigihêje malê gelemperî.

Bi texmîna min wê nizanibû  
ku tîna min hêzeke deryayî ya keştîxur e  
çîna min hêzeke bejayî ya hespxur e  
û vîna min hêzeke esmanî ya kêvrîşxur e;  
lewre bi mûçilkan li tevger û axaftinên min ba ketibû  
û fenanî nojdarekê birîna dilê min dikewand.

Wan çaxan  
serraxa evîndaran esmanekî hilmmij,  
binraxa wan xweliyeke narîn an xesîleke cîlîn  
û balgiyê wan her du çepilên çeperast bin seran bûn;  
lê min tolazê çarde duwalan  
dendikê şer ber bi jûra wê ya kozmîk dikudand  
û dil bijandibû aramiya bihuşta wê  
ji ber pest û renca dogehyan.

Nizanim dem çawa bihurî  
û şev çawa vegeriya nîveşevê;  
lê baş dizanim ku sibe tîra rojê  
-piştî modernîteya bê post û dost-  
wê dilsojê  
çendîn lanet barandin,  
çendîn caran tif kir riya çûyînê,  
rûyê wê matoşqeya ranjev  
ku bi xatirxwastineke erzan  
ez jê veqetandim û birim olamê.  
Hê hê jî kes nizane,  
kî li bextê wê keniya,  
barijên axlêveyê çawan girtin çawan  
çawan zîl vedan ew beybûnên nav zeviyan;  
lê diyar e ku hezkirin fişengeke sincirî ye  
û ji lûleya şevreşeke tiptarî fistiqiye.  
Rast e, ez bi sorav û boyaxên sextekaran naxapim,  
-lê derew dijminê Xwedê ye-  
ez ji vê dûrketina bêrewişt pir daxnaxî me.

04.06.2023; 00:17  
Buxarest, Romanya



## 5. Sûc û ceza

Carek ji caran,  
-rehmet li dê û bavê guhdaran-  
kalemêrekî efrîqî çîrokeke balkêş gote min:  
Rojekê nêrekerek û pilingek rastî hev hatin  
û rewşa hev pirsîn;  
guhdirêjî gote çîpdirêjî:  
"Sipas ji Xwedê re ku giyayê sût û hêşîn pir e



*û rewşa min jî vê gavê pir baş e”;*  
 lê pilingî israr kir ku rengê giyayê ter hertim kesk e.  
 Lewre nîqaş gur bû,  
 her duyan biryar da ku biçine hafa şêr  
 û li ba mîrê daristanê mijarê çareser bikin.  
 Dema gihiştin huzûra mîrê daristanê  
 nêreker bi dengê bilind zirriya û  
 doza xwe wiha pêşkêş kir:  
*“Mîrê min, ezbenî,*  
*ez dibêjim giya şîn e,*  
*lê piling idîa dike ku giya kesk e.*  
*Ji kerema xwe re cezayekî misteheq bidê.”*  
 Şêrê ji vê pirsê tengijî  
 demildest irriya, ji hêrsan girnijî  
 û biryara xwe wiha eşkere kir:  
*“Pênc sal cezayê bêdengiyê*  
*li pilingî hat birîn;*  
*heke taet nekir û axivî,*  
*bila zimanê wî bê hilqetandin.”*  
 Nêreker bi kêfxweşî zirriya  
 û ber bi çeregeha xwe meşiya.  
 Pilingê matmayî sezayê bêdengiyê pejirand;  
 lê dîsan jî xwest hinceta biryarê ji şêr hîn bibe.  
 Şêrê zana û jêhatî  
 mijar şirove kir  
 mîna dozgerê lihevhatî:  
*“Ev ceza ne ji bo agehiyên rast an jî derew e.*  
*Gava mexlûqekî fenanî te hişyar, jîr û çalak*  
*bi mexlûqekî nezan, axmax û fanatîk re bikeve nîqaşan,*  
*xera dike navê pak û başan.*  
*Ji aliyê din ve,*  
*tu bi vî gêjî re ketî nakokiyên*  
*û ez mijûl kirim bi pirsên beredayî;*  
*her wiha ji ber xweperestiya xwe*  
*tu daketî asta xêvikekî ji hevalan mayî.”*

Pilingî katara stûyê xwe xwirand  
 û kir ku here;  
 lê qaşo dilê roviyî pê şewitî û pirsî:  
*“De bibêje jîr û çalakê daristanê*  
*tu dê çawan derbas bikî pênc salên bêdengiyê*  
*mîna dîlên goşeyê zindanê?”*  
 Piling neaxivî  
 û hema ji nişkê ve li huzûra şêr  
 xwe gihande roviyê kone  
 bi lekmekî pişt lê şikand,  
 rovî vexiste erdê,  
 pêşiyê her du hêt xwarin  
 û bi dû re her du pîl gemirandin.  
 Her wiha bersiv neda lavahiyan  
 gava roviyî digot:  
 “Birako, çalako, va ye naxira keran;

tu çima naçî nêçîra dijminan?"  
Lewre bi "aferîn"a şêrê dozger  
dest pê kir hukmê sezadanê.

Piştire pilingî bi qasî pênc salan  
bêdeng êriş kir kerên kedîkirî,  
garan û mozirgan talan kirin  
û kelax rêz kirin li best û beyaran.  
Pilingî kira xwe kiranî kir  
û cara xwe caranî kir;  
di encamê de bû nandarê gelek ajelên kovî  
çeqel û çûqelan jî debara xwe kir bi bermayeyan.  
Roja ku seza qediya,  
mîrê daristanê merasimek li dar xist  
ji bo xelatkirina pilingê hêja  
û ragihande tevahiya daristanê:  
*"Ciyê ku ez ne lê me,  
cîgirê min piling e;  
cihê ku ez lê me  
alîkarê min piling e."*

05.06.2023; 01:11  
Buxaresta Romanyayê



## 6. Merasima dewrkirina text û tacê

Wan rojên han  
min guh berda axaftina pîremêrekî çînî,  
wî çîrokeke balkêş vedigot guhdarên xwe,  
min xwest şîreta wê biguhêzim helbestê  
û serê we neêşînim bi şêwazê pexşanî:  
*"Rojek ji rojan  
dema ku segan hestî û mişkan telîs dikojan,  
mîrê daristanê Şêr birçî bû;  
ji nedîtina nêçîrekê rûyê wî pirçî bû  
û rovî jî li ber destê wî çerçî bû.  
Carekê diduyan irriya û gîrnijî,  
lê rovî ji tirsan melisî û nermijî:  
<-Ezbenî, Xwedê hêz daye te  
û konetî bexşandiye min belengazî.  
Fermo, ka daxwaza te çi ye ji vê dinyayê?  
Heke nikarim bikirim û bifiroşim,  
lê ez ê bi fend û fûtên xwe  
nêçîrekê raxime ber lekmên te.>  
Şêrî gote roviyî bi canbêzarî:  
<-Here, ji min re xwarinekê peyda bike;  
nexwe li gorî qanûnên daristanê  
ez ê te veçirikînim û bixwim li dera hanê.>*

Roviyî çerçîtiya xwe ji bîr kir  
û nermînga fizirî ji wir  
da ku fermana şêrî bîne cih.  
Lewre hanzûka xwe gihande hinda kerê  
got ku <rabe, bilezîne; şêr mîrekiyê dewr dike.>  
Gava ker derkete pêşberê  
şêrê birçî xwe ranegirt,  
xwe qurafte hev û êriş kir serê;  
bi pêsvikî dev avête stûyî,  
lê her du guhên dirêj ketin berê.  
Ker bi qutbûna her du guhan filitî,  
û gote xwe: <Roviyê xayîn ez xapandim  
min got ez ê bibim mîr,  
hindik mabû ku şêrî ez dadiqurtandim.>  
Lê roviyî hêviya xwe nebirî,  
li pey ket û gote kera behîtî:  
<Heyran, guhên te pir dirêj bûn,  
şêr xwest wan gurûs bike  
da ku taca zêrîn bide ser;  
vegere text û tacên xwe.>  
Kerê bawer kir û zivirî,  
lê şêrî dîsan êriş kir  
û vê carê jî boçik birî.  
Ker beziya bi zirrînî û zîqînî,  
dîsa canê xwe rizgar kir bi arxayînî.  
Gava rovî li pey ket,  
ker qanî nebû û gote fêlbazî:  
<-Gotineke pêşiyên mirovan heye û dibêjin:  
gava ker li cihekî kete herî û ciqnaqê,  
êdî tu wî bikujî jî derbas nabe ji wir.  
Te malik li min şewitand û ez riswa kirim;  
min da pey hewesa mîrekiyê  
lê şêrî bi qutkirina boçikê ez dax kirim.>  
Roviyê kone vê carê neçar ma  
ku derewa xwe ya paşîn bike;  
nameyeke emanê binivîsîne ser kêp  
wî kapî bi mor û xişiran bixemilîne  
û kerê li şêrî vegevine.  
Lewre gote kera bizdiyayî,  
ji tirsan heta serê kaşekî reviyayî:  
<-Çi çîreçîra qûna te ye û ditirsî?  
Ma nabînî ku boçika te ya hişkolek  
bûye belaya serê te  
û nahêle ku bi rehetî rûnêyî ser text.  
Bi qutbûna wê boçikê  
êdî te hemû şert û mercê tamam kirin  
û va ye nameya emanê ya mîrê daristanê  
û dibêje ku were rûnê li ser textê hanê.>  
Kerê dîsan bawer kir ji roviyî,  
qinaet anî bi emannameya koviyî.  
Vê carê hêrsa şêr jî hatibû  
û sond xwaribû ku firsendê nede kerê;

anîn bîra xwe nêçîrên xwe yên berê,  
di mêjîyê xwe de gerandin hemû êrişên bijarte,  
ji nişkê ve xwe avête qirika kerê  
nehişt bipirpîte û nefes jê derê.  
Gava ker cehimî û mirar bû,  
şêrî gote roviyê dekbaz:  
<-Here, kerê post bike, kelepîçe bike;  
pêşiyê dil, ceger û mêjîyê wê ji min re bîne!  
Ez gelekî westiyam û qudûmê gurandinê nema;  
bila bi xwarina wan  
ronahî were ber çavan.  
Piştî ez ê kerê zêl kim,  
helbet zikê te jî têr kim  
destmîza te jî bi rê kim.>  
Rovî hat û bi ser kelaxê bêruh re sekînî;  
pêşiyê serî gurand û mêjî xwar;  
lê dil bi cegerê ve ji şêrî re anî.  
Şêrî çavek li xurîniyê gerand,  
nihêrî ku mêjî tuneye di nav de.  
Lewre irriya, gîrnîjî û qêjiya:  
<-Kuro serhevde,  
ka mêjîyê kerê?  
Min sê daxwaz gotibûn te  
lê nedît mêjî di nav de.>  
Roviyî firkek da stûyê xwe,  
dêla xwe kaş kir binzika xwe  
û bi şêwazê ajelê matmayî  
qaşo gelekî tirsîyayî  
gote şêrê ji hêrsan teqîyayî:  
<-Mîrê min, ezbenî!  
Min ji bîr nekiriye fermana te!  
Mixabin ez çiqasî geriyam û negeriyam,  
min qaçotkê sêrî qulqulî kir û westiyam;  
lê dîsan jî min nedît ku mêjî li ku ye;  
wisan bawer dikim ku mêjîyê keran tuneye,  
heke hebûya,  
ka sê caran dikete heman xefikê  
carek guh wînda dikirin  
û dîsan qumbar dilîst li ser boçîkê?  
Îcar guh û boçîk çûn,  
ka dîsa ji bo text û tacê dikete dehfikê?  
Mîrê min serê xwe neêşîne bi mêjîyê keran  
Bixwe tiştê teze teze hatî  
û vepelê ber cendekê mayî bi noşîcan!>  
Şêrê birçî zêde nefikirî û rovî rast dêrand;  
êdî li ser qenciya roviyî  
heyameke xweş li ber kelaxî bihurand.”

Dema ku pîremêrî çîrok qedand,  
ji bilî min her kes kenîya.  
Ji ber ku hişê min  
bi wergera wê re dibiliya,

min demildest rahişt qelemekê  
û helbesteke xelexwarî  
çîlovîlo kir ser kaxezê qederekê.  
Va ye min şîret guhaste zimanê we,  
bi xwendinê serf kir zemanê we,  
bibexşînin heke acizî dabe we.

11.06.2023; 00:21  
Buxaresta Romanyayê



## 7. Bexşîşa straneke te ye stûyê min

Dizanim,  
te dîsan gewlazê gazindan avêtiye stûyê min,  
ew stûyê ku hertim xwarî nehtika te bûye  
ji bo maçeke xêrhatinê;  
lê divê bizanibî ku gazind  
giyayekî ziyankar e li zeviya evînê,  
berê evîndarî dide biyanistanan û erdnîgariyê pê dide guhartin,  
mercên jiyane lê dijwar dike û hevrazan pê dide hilkişandin  
dem û dewranê lê dike jehr û ziqûm, diteribîne govenda şahiyê.

Roja ku ez gihiştim vê biyanistanê,  
min gewlazê te raxiste ser şaneşînê,  
ew gav bi gav çilmisî li wê derê  
û ez derbas bûm serşokê;  
-bêyî te ne xweş be-  
min bi aveke şîrogermî ya herêmî cendekê xwe şil kir,  
bi sabûneke erebî bêhna giyayî ji ser çermê xwe rakir,  
û bi şampoyeke ewropî porê xwe heta tara têlan mizda.  
Mixabin çend têlên xayîn zû hilweşiyên kêzînê,  
lê yên berxwedêr rabûne hilperkeyeke hewramanî  
li ser tepa serê min î hêvotî bi wêrekiyê.  
Ew wêrekî xisletekî taybet bi min e,  
dayika min a kurmanc raçandiye li rehçikên min ên herî ziravk  
bavê min ê sofî jî bi pesna pakîyê nepixandiye siya vî xisletî  
li ser defa sîngê min î ku bi niç û viçan tepisiye hev.

Va ye soleke bêbendik diavêjim binê piyan  
ber bi karê rojane xar dikim çîpên şidiyayî bi hêviyan;  
lê gava dizivirim ji xebat û olamê  
hê li ber şêmîk û sivderê  
dîsan bêhna gilî û gazine te  
kulfikên pozê min dişewitîne.  
Lewre radihêjim giyayê hişk û ziwabûyî,  
wî berdidim kîsikekî naylon  
û dêv lê gilê dikim.  
Wekî ku dozdark ceza dibire li tawanbarekî,

ez jî wisan bêhnê diçikînim li wî giyayî;  
ew giyayê ku bûye nîşaneyê koçberiya min.  
Şaş fême neke,  
min gazindên te neavêtine berê riyên an jî ser sergoyan;  
-berevajî vê tohmetê-  
min gewlazê te yê çilmisî kiriye bin balgiyê xwe,  
vê êvarê û her êvara xwe ya bêyî te  
wî stûyê westiyayî dilorînim ser xewnên tijî bi dîdarên te.  
Êdî min çîroka me avêtiye ser banê dîdarên hevîkirî  
û stûyê xwe bexşandîye wê strana te ya pêşîn  
ku te li ber guhê min gotibû  
ligel dengê erbaneyêke kurdî:  
*"Îşev şeva te ye, de tu li mala me be!  
Balgiyê me yê qutnî wê berpala te be!  
Kaniya me hevraz e, wê şerbeta te be!  
Dayika min rindîk e, wê xwesûnga te be!  
Bavikê min î kal e, wê xezûrê te be!  
Birayê min î biçûk wê bûrangê te be!"*

16.06.2023; 22:10  
Buxaresta Romanyayê



## 8. Dîsan dor nehate Kurdo!

Hizirî Kurdo û êpêcekî hizirî;  
ji nava xewn û xeyalên xwemalî fizirî,  
li ber tava derewên hevrikan kizirî  
û ne bi pexşana Mele Mehmûdê Bazîdî pijiya  
ne jî bi helbestên Melayê Cizîrî  
ji jora wêjeyê bi ser bervejêra civakê de gindirî.  
Pêşiya pêşîn dijûnek gihande bavê mirî,  
çima ku ew navê teşqeleyê Kurdo lê kirî.  
Nediwêrî, welleh billeh nediwêrî  
ku navê xwe rast bibêje tirkan  
an jî kesên ku bi tirkî diaxivîyan;  
lewre bi wateya "gur" navek li xwe danî  
û got: "Ben Kurtum", ango "ez gur im".  
Gava jê pirsîn: "Tu ji ku yî?"

ziman di dêv de bû kulavê bizûzxwarî  
û li pirsê vegerand bersiveke têkçûyî:  
*“Em ji Welatê Rojê hatine, ji Xoresanê;  
navê kalikekî min Kurt Paşa bûye  
û ji bo yadgariya wî navê pîroz  
ez hatime bexiştandin;  
lê mixabin karmendekî rojhilatî  
bi nezanî yan jî bi minexetî  
şaş nivîsandiye navê min li defterê,  
ne ku bi /t/ya tirkî, lê bi /d/ya darî.”*

Hizirî Kurdo û êpêcekî hizirî;  
ji nava xewn û xeyalên xwemalî fizirî,  
piştire xwe siparte nifşeke hov a kûtxur û serbirrî;  
ew nifşa ku mîna mazê qert li mak û xwişkên xwe zivirî,  
ew nifşa ku sexbêrî dikir li wijdaneke aviskirî  
wê roja reş a piştî êrişeke tatarî.  
Ax Kurdoyê qeşeng, xwediyê rûyê qemirî!  
Xwezila te bimîsta wê dibistana biyanî ya ku tu perwerde kirî,  
ya ku fêrî te kir taetêke bêsînor bi devekî mirî!  
Xwezila dîsan ew zimanê te yê sor li xwe mikur bihata,  
te dîsan straneke dengbêjîyê ya rûniştî bistra,  
Teyrê Sîmir nebilbilanda,  
lê belê zarê bazan li qirikê dagirta,  
hişyar kira kerrika guhê min pîremêrî  
û bi terzê hakimî erdê li bin piyan hilkuta:  
*“hey lo malikwêrano, xwîna kuştîyan a sor bêsikur hilnayê;  
êdî rastiyeke eyan e, li devê xwendî-nezanan beyan e  
ku li welatê kumsoran dengê kumreşan dernayê”.*

Hizirî Kurdo û êpêcekî hizirî;  
ji nava xewn û xeyalên xwemalî fizirî;

hesp bezande meydana xefletê,  
xew revand bi şevbihurkên şehwetê  
û li ber besta Çîrvanokên Hezar û Yek Şevan  
pexşaneke hizhizî ji xalbendiyê kişkişande ber helbesta herikî  
dema ku Stêrkhebînê bilûrek diguvguvand li ber guhê Gayê Sîs.  
Ax Gayê Sîs axxx!  
Te bi wî exlaqê xwe yê pîs  
çima Gayê Çûr bexişande hov û koviyan;  
ka tu yê çawa li deryaya poşmaniyê bi dengê bilûrê bixeniqî?

Hizirî Kurdo û êpêcekî hizirî;  
ji nava xewn û xeyalên xwemalî fizirî;  
Gava lehiya helbestê sikra pexşanê bi ro de bir,  
wî jî edetî palebetalan xwe li wêjeyî danî  
û bi helbesteke beredayî  
li dûrî asîtana Hîvhebînê kete îstirahetê:  
*"Dêreyê binefşî yê yarê meles e;  
rawestayê ser çima kendalê çûnehatê,  
û diyar e ku mîna dê û bavê çî teres e!"*  
Wê çaxê ez î li aliyê din î kendêl bûm  
û min guh dida gotineke pêşiyên Rojhebînê:  
*"Hesin naşkê, lê bi zenga xwe dirize;  
civak têk naçe, lê di gendeliya xwe de dixeniqe."*  
Ji nişkê ve  
min bihîst ku dengê çepikan  
hêwana nimayişgehê hejand  
mîna berqa birûskekê;  
lê miya hêşînkew a serberanî wekî her carê  
çêreya bi roj daqurtandî  
bi şev vedikaya li mexelê vehêsînê  
û min helbestvanî  
wekî wî şivanî



çav kutan stêrkên esmên  
fenanî bazekî bêtirs  
ku ji esmanekî bêstûn erdê dimêyzîne  
û nêçîra hilbijartî dişopîne.  
Min di nava wê hilkehilkê de niçande Rojhebînê:

*"Ma neçim serdana Stêrkhebînê  
yan jî hawariya Hîvhebînê?"*

Keserek kişande dil-hinavên peritî û got:  
*"Heke dixwazî biçî, here; qe mesekine!  
Qe nebe mîna wefakarê çûyînê biçe desttîjî,  
qe nebe hînî wefakariyê bibim bêyî te ez jî!"*

Rawestiya Kurdo û êpêcekî rawestiya;  
û mêjiyê wî yê qulqulî ji hizirînê  
li ser heft pileyên hevahengiyê westiya:  
hevxemên heman derdî,  
hevçavên li dêrd bûn xwedî,  
hevdevên li pêşberî wî nemerdî,  
hevramanên li ber dareke bêkerdî  
hevrêyên armanceke sermedî  
hevdilên meşqeke sîqalkirî  
hevgiyanên koçeke hêvîkirî.

Rawestiya Kurdo, êpêcekî rawestiya  
li ber derê Saziya Ziyanpirsiyê;  
di destpêkê de serbazekî biyanî yê bîj xelîfetî jê dizî  
li naverasta Xînûsê heta Bedenên Amedê yên derizî.  
Piştî xulamekî Bîjo yê kurd paşatî jê stand  
dema ku balafirên ingilîzên xaçperest  
bêyî fermana Îsa Mesîhî doralîya Araratê dabarand  
bi bombeyên tepteze û mixên jehrkirî.

Sal hate ser salê,  
lê Kurdo venegeriya malê;  
ne kesî dîtibû ku rizgar bûye ji kurdqiranê  
dema ku jehrdadayî kirin şkeftên Munzirê,  
ne kesî dizanibû ku li Qada Çarçirayê hatiye daliqandin  
dema ku barzaniyan bi çek û rextan Erez û merez derbas kirin,  
ne jî kesî bihîstibû ku Kurdo gihiştiye mafekî mirovatîyê  
piştî biryara dadistaneke mafên mirovan a mişextî.

Serê we yê delal neêşînim bi nûçe, nav û nûçikan;  
bi tif û kevirên li pey tajî û kûçikan  
dil û hestên we yên germ nebîrêjim  
li nava tendûra sincirî  
û li ser agirê kuçikan!  
Va ye Stêrkhebînê nivîn raxistine,  
Rojhebîn gazî min dike  
û Hîvhebîn jî çav dike laqirdiyan.  
Gava yekê got: *"Bes e, êdî binive! Havînê şev kurt in!"*;  
min fêm kir ku *"sisê li hev asê"* ne,  
ji bo para şevê li ser kendalê tasewasê ne  
û dest pê kiriye ezmûna rêveberiya min.  
Lewre *"erê"* dibêjim û diqilqilim;  
lê di ber xwe de dibêjim  
û bi henekan dibilim:  
*"Rabe Omito, bilive nivînan!*  
*Dîsan dor nehate Kurdo*  
*ku bi zimanê bav û kalên wî*  
*helbestên dirêj birêsi ji mûrî û mirwariyan!*  
*Dîsan dora Kurdo nenivîsi pêristan,*  
*navê wî nekete deftera mişkan*  
*û di serdema Neteweyên Yekbûyî de*  
*yekîtî nebû para pênc tiliyên destan!*

*De rabe, serê pîranîyê bi kulmê neçe dirêşê;  
li benda te ye taximeke sîngên cincilî bi şexşêbexşê!"*

30.06.2023; 20:08

Buxaresta Romanyayê



## 9. Kurtikên havînî yên milqol

### I.

Gelo jîyan çemek e û diherike mirinê;  
yan maweyeke diyarkirî ye  
ku tê jenandin û plankirinê?  
Rast e, mirov bêyî hîlbijartinekê tê cîhanê;  
lê belê gava hişê wî gav avête têgihîştinê,  
dest pê dike berpirsiyariya wî  
û neçar e ku bersivê bide hemû pirsan,  
ew pirsên wekî kî, çi, çawan, kanê  
kengê, çima, kîjanê...

### II.

Her werzê bi pergala û pêwistiyên wê bixwîne xorto!  
Pîremêro, xwe neke şûna ciwanekî zirto  
û nebêje *"ez li dewsa te bûma, min ê wiha wiha bikira"*!  
Ji xwe te di çaxa de wisan kiriba  
tu dê bibûyayî moçika civakê  
û her kesî dê niha wisan kiriba  
û hewce nedikir ev şîreta te ya derengmayî;  
lê te deynê xwe daliqand van rojan,  
derbas bû temenê ciwan  
û li te sist bûn çong.

Loma bêmiraziya xwe dikî xeyda stûyê xweziyan;  
xweziyên xwe dikî planên paşerojê  
da ku bikemilînin nifşên tezehatî  
ew ên ku bi deyn-dûyên te mane heyran.

### III.

Tu guh nadî gotinên min;  
wisan e, hêviya xwe bibire ji guhdariya min,  
dema ku serê gotinekê vedikî  
yan binê şîretekê rast dikî  
yan jî zikê henekekê digidgidîni edetî amê  
bi pertafeke ji vir heta dera han tijî vir û kuşekuş.  
Bizanibe ku dema min tuneke ji qîrevîrê re,  
wekî ku dizanim tirsê te jî tuneke ji çîrevîrê.  
Hey wax, lê mirin bombeyeke çalak e:  
dibe ku her gav biteqe  
û em careke din rastî hev neyên li ser destexanekê,  
dibe ku zendên me ji hev raqetîne piştî şahiyekê,  
dibe ku vê xweliya li bin piyên me  
vegerîne goreke bêkêl a mîna korekortalekê.  
Wisan e, ne bi zorê;  
were, em bi dorê  
biaxivin û guhdariya hev bikin  
an jî ne biaxivin  
ne jî neçar bimînin  
ku guhdariya hev bikin.  
Lê dem û jiyana diherikin  
bi me yan jî bêyî me;  
hinek hene dikarin biaxivin  
û guhdariya hev bikin.  
Mehtel nemîne,  
lê dibe ku ev "hinek" bigihêjin biryareke hevpar jî.

#### IV.

*"Ji serê qijikê qelî çênabe"* digot û serê xwe dihejand;

min jî digot *"belê"* û lêva xwe xwar dikir

û bi gotineke hevta civat digerland:

*"lê nizamim, îcar çima qijikên reş hêkên spî dikin?"*

Wê jî eynî mîna min lêva xwe xwar dikir bêbersiv;

min ne dizanibû li bersiva min e ew bersiv

ne jî dizanibû ku li ser gotina min ponijiye

û matmayî daye ew bersiv.

Gava wê yehyehî nêriyan dikir,

min çêleçêleyî noginan dikir;

lê rojek ji rojan

bi min re nekete rikeberiyê,

gava ku belezûrî Xwedê bûm

û lavayî lê kirin.

Erê, nedikete rikeberiyê;

lê nedigot *"amîn"* jî

wekî ku piştrast nedibû bi min

ne ku bi baweriyê.

Êdî çawan hebe!

Bihurîn, ew roj jî bihurîn;

em her du jî guherîn,

min destê keçeke din girt

û wê destê kurikekî din.

Îcar qederê em ajotine riyân,

em ji hev bihurîn,

dîsan dîsan ji hev bihurîn

bêsilav, bêbac û bêpaç

bêzirav, bêkuxik û bêniç.

*05.06.2023; 23:28*

*Buxaresta Romanyayê*



## 10. Du stranên evîni û yeke mêrxasiyê

### I.

Rojbanûya Mala Gajîran şefeqa vê sibehê naliya û got:  
*"Hejaro zozanvan dîsan çûne zozanên jorîn;  
delalo vê kelegermê derbas nabe bêyî te havîn,  
Ji neh saliyê û vir de me xwe sipartibû bextê dilan;  
lê kuro nehso, beranê bisko yê nava êlê,  
te ez hiştim li vê aranê, li bintînên bendeyan!  
Qira Xwedê li binaşeya xwendiyên axozî bikeve,  
kotanê Eysa Pêxember binçirka haviyan biqelîne,  
roja ku edetî torin û dewletiyên  
malbavanê tu şandî wê dibistana biyaniyan,  
çûyîna te ez jî ajotim olamê û şixulê maliyan;  
lê bizanibî ku her du çavên min li riyan deliyan,  
devê min xwar bû li ber radyo û televîzyonan,  
hêlîna zimanê min şehitî bi hatin-çûyîna qereçiyên,  
peyvên kurdî mîna kevokên bejî jê firiyên.  
Hey wax li min ê ku nikarim zimên bi pesna te bilivînim  
Şekl û şemalê te li nameyake kurdî bi liyaqet binvîsînim.  
Ez ê zêde nebêjim û nebilînim,  
derd û kulan li hev nealînim,  
hevrikan bi vê êşê nehêsînim.  
Gelî milyaketan, gelî ruhên qencan!  
Gaziya min a ji kûrahiya dilekî peritî  
bigihêjînin xwediyê vê tivingê û vî qapûtî!  
Bibêjinê: Hejaro lawo, delaliya te ya bedhal e;  
ji êvara Xwedê heta dîkê berbangê kûrekûr dinale,  
dermanê derdê wê tu yî, salixekê bişîne ku çî hewal e."*

07.07.2023; 23:25

Buxaresta Romanyayê

### II.

Şevbanûya Mala Gajîran tarîbana şevê hejand û got:  
Hejaro heyran, her du keziyê min canikê ji bejnê re qurban!  
Sala îsalîn temenê min porkurê nozdeh quliband gihişte bîstan,  
qeysa sola min mehrûmê derkete sî û heyştan;  
lê dilê min î zelal î mîna caman, mîna şûşan  
şa nebû li vê wêrtasa aranê bi lorî û dergûşan!  
De tu bidî xatirê mizgefta hoza Sakan delalo,  
bidî xatirê Çilexaneya bereka Keleşkiyan nêzelalo,  
bidî xatirê şîretên seyda û melayên hucreyan bêmelalo,  
ma gişkan hînî te nekîr merhemeta keç û kesûkan rewalo!  
Min qurbana wan tiliyan, wan defter û qelemên xwe kî,  
destmala min a neqîşandî rûmalêja cuz û mishefa xwe kî,  
carekê derkevî ser ekranan behsa serkeftinên xwe kî,  
ji camêriya xwe navê min eşkere nekî, li nava hozê şermezar nekî,

behsa jena dilê min î pirpitî heta qiyametê ji tu bendeyî re venekî  
tenê bibêjî *"ez ê filan zemanî vegerime warê bavan,*  
*bi kebîna dildarekê bibirim zimanê xêrnexwazan",*  
bibêjî *"yek li benda min e, ez ê wê bigihêjînim mirazan".*  
De wî wî delalo qurban-heyran, de wî wî!  
De wî wî, rewalo miraz tu yî, de wî wî!

Hejaro qurban berê min nede hevrazan;  
şênîyên gundên çiya-baniyan hov in.  
Welleh berê min nede berjêran;  
şênîyên deştê ji paletiyê piştkov in.  
Billeh berê min nede bajarên;  
ew biçûk dibînin me keçên gundiyan.  
Tilleh berê min mehrûmê nede biyaniyan,  
ew bi gefa çêkûç û zîndên dîl digirin kurdan.  
De wî wî delalo, derdê min î giran e;  
lê Xwedayê Jorîn raçav dike bendeyan e.

08.07.2023; 00:10  
Buxaresta Romanyayê

### III.

Rojbanûyê, delalê wêranê bajêr li korta han e,  
Şevbanûyê, bêmelalê çiyayê şewitî li fêza han e,  
Min î ji hêsiya çiyê li bajêr dinihêrî, jê quloz dibû toz û dûman e.  
Ew bajarê avakirî bi ked û xîreta çendî çend mêran e,  
ji çendîn şerên qewimî hatibû parastin bi zora şûran e.  
Sond dixwim, Stêrka Hingorê guwahê hemî nûçe û bûyeran e.  
Min î ji Xana Çilrewaqî li hêsiya çiyê dinihêrî, jê quloz dibû toz û dûman e.  
Siwarên kurdan girtibû ser kozikên dijminan,  
wan segbavên ku ne digot ev î *"elewî-sunî ye",*  
ne jî digot *"ev êzdî ye, evî hanê yî misilman e",*  
tenê diqariyan *"ev kurd e, bikujin û biavêjin newala han e".*  
Îcar vê sibeha xêrê, bi qewlê mêrê berê,  
siwar ebabîlkî raweşiyabûn best û beyaran,  
alayên hov û derekeyan dadixistin yeko yeko.  
Peyarên kurdan girtibû ser zindanan,  
deriyên wan dişkênandin bi xîreta Çeko.  
Jinên kurdan kon vegirtibûn li talde û meydanan,  
derman dikirin birînen birîndaran,  
çêrmên herîşî dikewandin bi pozikên xenceran.  
Pîremêr û pîrejînan sîtil dabûn ser kuçikan  
xwarina şerkaran dipeht, enî dimalaştin bi devhuçikan  
Nûgihanên kurdan xwe dabûn pala çiyê,  
bi kevirkaniyan diparastin zarok û nexweşên li bin hêşiyê.  
Hêwirze ketibû nava gund û tax û bajarên;  
Gişkan bi yekdevî digot: *"Îro roja xîretê ye.*  
*Her kiyê ku radibe tivingan, bila bêxîştexşt bilezîne.*  
*Her kiyê ku li benda fermanê ye, bila tevgera xwe bişopîne."*  
Îcar bibêje ez ê çawan werim hewariya dengê we delalan?

Pornekurino ez ê çawan navê siwarên Celaliyan xera bikim li nava maqûlan;

ji Eylemê heta Deylemê ategoriyan li pey leheng û pêşengan xim,  
kilamên dildariyê biavêjim ser keçan, zimanan li ser me dirêj kim?  
Heke hûn wisan dilsoz in, de werin qûntara çiyê, va ye ez î hatim.  
Bila bavên we bibin mela, bira bibin şahid û kebînê bibirin.  
Piştî vê gavê, van soz û peymanan  
êdî erd ji me re binrex e û esman jî serrax e,  
lê divê em çong vedin ber rehleyan;  
bişopînin tîpên alfabeya xîretkêşan;  
rast e, ne ez î pisporê çek û rextan im,  
ne jî hûn ên perestarên kul-birînan in,  
lê qelemeka min heye, ez ê binivîsînim dîroka gelê azadîxwaz  
qe nebe hûn jî kotikên siqawêlan bigirin û derdorê vebijêrin,  
hemû berate û nîşaneyên dagirkeran ji sivdera welêt biqewêrin,  
min qurbana wan tiliyên henekirî, wan zendên bazinkirî kin,  
gildîna derketî biavêjin ser sergoyên Bîrahîmiyan, ji hewşê rêç kin  
û jîngeha zarokan qirêj nekin bi deynê teraliyan gidî lê lê.

09.07.2023; 22:38

Buxaresta Romanyayê



## 11. Strana şehîd Kenanê Elî

Hey lo lo, hey lo lo roja îroyîn dilê min î liyan e;  
dibêjin qulingê sîs perwaza xwe betal kiriye,  
êdî nafire li ser Çiyayê Kurmênc û Efrîna kurdan e.  
Kes nizane gelo bazê belek jar û birîndar e,  
yan her du baskên wî bi daredirriyekê ve aliyanê.  
Hey wax li mino çima cîhan kerr û lal bûye;  
temaşê dike xûlexûla mar û mişkan e.  
Ma neviyê Îrecî ewqasî bêhay û nezan e  
ku nizane îstiqameta Tûr û Selmî Kurdistan e;  
çima bavê Havînê Kenanê Elî mehrûm û nivîşkan e  
ku notla Manîçehrî dest neavêje tivingê  
û banz nede meydana merdane.

Hey lo lo, hey lo lo vê sibengê dilê min î liyan e;  
ji Rûmistanê berveqible bûye Kenanê Elî mîna misilmanan e,  
dinihêre agirek li ser piştê Efrîna rengîn vêketiye,  
şemalê dide Keibeya Îsmayilîyan û Qudsa Ishaqîyan e.  
Dihizire gelo ev agirê Mûsa Pêxemberê li ser Tûrê Sînayê ye  
yan balafirên xaçperestan ketine bin fermana Jontirkan  
û agirdadayî dikin, jehrdadayî dikin Ararata bav û kalan e.

Hey lo lo, hey lo lo vê nîvrongê dilê min î liyan e;  
Balafirên cengî mîna qijikan, fenanî teyrê berateyan digerin,  
ji esmanê Efrînê dibarînin bombeyên hemî cureyan e,  
qîjeqîja zar û zêçan, nalenala birîndaran digihêje erşê li fêza milyaketan e,



wijdan ketiye xewê, mirovdost ketine qeylûleya erebên çolan e.  
Tenê destê mêrxas û jinxasên efrînî dixebitin mîna şêran e,  
tenê kurdên xîretkêş û hevalbendên wan li ber dijmin radipelikin şeran e,  
Kenanê Elî û rêhevalên wî hişyar in, tiving li destan e;  
geh banz didin kozik û çeperan, êgir dibarînin ser dijminê hovane  
geh direvin hawariya birîndar û hejarên ku bêxwedî û bêsexbêr mane.

Hey lo lo, hey lo lo vê êvarkê dilê min î liyan e;  
Şeverêşekê cîhan rapêçaye, çav nabîne çavan e,  
tenê li dora Çiyayê Kurmênc hezar agir vêdikevin  
şemalê didin Çiyayê Gewro û dorberên wan e.  
Qîrçeqîrça dengê gule û fîşengan e,  
girmegirma dengê top û bombeyan e,  
serê mêrxasên efrînî mîna bişkovên biharê diqelêşin,  
lê radest nakin bajêr li hêzên tûranî û nokerên wan e.  
Kenanê Elî û rêhevalên wî mîna ebabîlan li sengerên Efrînê raweşiyane;  
bajarê kurdan ê qedîm diparêzin ji hêrişa Ebrehe û Ebû Rexalan e.

Hey lo lo, hey lo lo şeva îşevîn dilê min î liyan e.  
Hey lo qulingo, hêlîna te bibe lana mar û dûpişkan!  
Te çima esmanê Efrînê, lûtkeya Çiyayê Kurmênc terikand?  
Hey lo bazê belek, şeva îşevîn tu bihasilî bi nikulreş û pencikreşan!  
Te çima gurê Asyaya Navîn bi ser Rojhilata Navîn de kişkişand,  
Havîna keça Kenanê Elî li Rûmistanê sêwî hişt, felek lê kenand?  
Hey lo gurê boz, lana te bi şev bibe hêlîna kundan, bi roj bibe pinîka mirîşkan!  
Te çima zikê mêrxasê Mala Evdilahê Qelender Kenanê Elî bi hovîti qelişand!  
Hey Efrînê, wax Efrînê! Sed aferîn ji berxwedana te re, ji şehîd û xaziyên te re!  
Te dîroka xwe bi xwîne nivîsand, rûmeta gelê kurd li hember dijminî nepelişand.  
Gidî felekê karê te yeman e, lê berxwedana Efrînê qeydkirî ye li ba milyaketan e.

13.07.2023; 05:13

Buxaresta Romanyayê.



## 12. Êdî tu bi şîrê xwe

Hê xewnên binefşî dibînim  
û tu bi wan kincên xwe yên binefşî digerî  
li lûtkeya wî çiyayê ku êdî nabînim.  
Dema ku te şeq vedida li ser navmîla bavê xwe  
û silav dida Çiyayê Agiriyê,  
ezî êdî lap mezin bûm;  
min şerm dikir li kolanê  
bi zarokên xulaman re kerkerane bilîzim  
û hilperikim hêlînen kevokên kedîkirî.

Carekê tu dîsan hatibûyî serdaneke dorveger  
û di navîna min û Xwedê de bihustek mabû;  
aha wê carê

min qax dikelandin li ser xaçirganan  
û ji cihê cih re dua û dirozge pêşkêş dikirin  
da ku piçeke din jî rawestî li kêleka min.

Tê bîra te?  
Te li bilqebilqa kelîna zerdaliyan dinihêrî  
û ziman li dora devê xwe dixist;  
gava lêvên te yên hewirmişî  
bi wê alastinê çirûsîn,  
heska di destê min de got rep  
û ket nava beroşa ku bêhenek disincirî.

Gelo tu dizanî ku ji bêgaviyê  
sîleyan dişîqînim li binê guhên bêdengiyê  
û pereyan direşînim ber def û neyên sazbandan  
da ku meqama me ya hezkirî dubare bijenin?

Ez û tu kirdeyên wan rojan in;  
lê ez wan bîranînan  
fenanî pirpîrkên serhengêkî  
li ser sermîla xwe dikêşim.  
Êdî tu jî bi şîrê xwe.

28.07.2023; 00:12  
Buxaresta Romanyayê



### 13. Tenê

Hingî ku Xwedê serê min daye tenê me.  
Geh li Kurdistanê me,  
bi tena serê xwe li kuçe û kolanan  
tîfî hêma û tabelayên dagirkeran dikim  
û sîngê xwe yî rikmij vedihêsînim  
bi hêviya zarokêkî bêguneh;  
geh li biyanistanekê me,  
bi tena serê xwe parêzvanê çolistanekê me  
û nahêlim ku bavê te yê umerî  
bendewariyên te yên rewa çal bike saxîsaxî  
heta ku zindî bim, biqilqile dest-pêçiyên min, kesk vêkeve jena dilê min.

Tenê me wekî ava bîrekê.  
Hemû lêkend herikîn û çûn,  
deşt û newal qelaştin û çûn,  
bi hevaltiya kevir û kuçikan bi zêrezêr û êşan çûn;  
lê ez di binê wê bîrê de li benda Êsiv û xewnên wî mam.  
Neçûm ku bi tasa xwe werî ser min,  
û bi xatirê tovê Ismayîlî  
qe nebe Hacerkî biçikilî ber min.

Dibe ku neyê bîra wê zarşîrîna dilpêzeveng;  
lê tu delîl û dêraneke dera han î,  
mîna rahibeyeke diltenik î,  
ji çavên te dizên çem û kanî,  
dikarî tomar bikî vê mikurhatina min  
li ser navê wijdan û binyada mirovahiyê  
bi tehrê *"dosyeya herî nihênî"*.  
Ez, belê ez,  
ew ezê ku bi bihaneya ezeziyê  
wekî berxê nêr ajotin ber kêra kalanî;  
lê kêr bihujî bi lazera bîbikên te,  
da ku ewqasî sivik nebe mêranî.  
Va ye devê xwe digihînim ber katara stûyê te,  
gotinên xwe fenanî hilmekê berdidim guhên te yên hişyar:  
*"Ez di xortaniya xwe de jî mîna Brahîmî tenê bûm,  
dîsan wekî wî bûm  
gava qedere pişt li min xûz kir  
û gopalê bîranînan da destê min;  
lê te bi xwe hêwî anîn ser şan û xîreta xwe  
roja ku ez tenê hiştim bi hêvî û xewnan,  
rastiyên min kirin wêne û pê pesiniyê  
qestiyên xwe kirin şene  
û samana helbestên min pê dayî ber bahozên xedar."*

Dibînî ku çiqasî tenê me,  
û hertim wekî xwe me;  
min, -erê min- baskên xwe hejandin û firiyame devkeniya te  
wekî ku Îmam Huseynî biryara xwe sparte nameyên iraqîyan.  
Min gazî û gazinên te givaştin sîngê xwe yî bi cizbeyê ketî  
û tu carî negot ku ev gul e yan kelem e,  
min tu carî cihê nekîr ku alav şûr e yan qelem e  
min tu carî hilnebijart xwarina destê te bê ka minet e yan ziqûm e.  
Loma îro wiha tenê me û îşev jî.  
Loma min berî te got *"ji te hez dikim û hê hê jî"*.  
Loma min razên xwe reşandin rezê te da ku bêtirs binivî  
û ber bi rûmeta sed sala xwe hilkişî,  
ne ku min tenê bihêlî,  
bêsilav, bêstran û bêsi bihelî.  
Madem ku ez tenê me, ka tu kirasê min bûyî?  
Madem ku xweş dirêsim helbestê, çima tu hê sermest nebûyî?  
Heke bibêjî *"de here, teniya bidono!"* û bi mehneya *"erê"* yê bikenî,  
wisan e, tu ew don î û ez jî ev tenî.

05-10.08.2023

*Ji lûtkeya Çiyayê Transfagaraşanê heta Buxaresta Romanyayê*



#### 14. Çi bi qestîka, çi bi rastîka!

Vê berêvarkê  
ji hişyariyê veciniqîm xewê;  
min tu dîtî li devereke nenas.  
Li metbexeke tijî feraq û tas  
te zarok têrkirin û şandin;  
hema li dora min çûyî û hatî,  
lê nebexşande min ramûsanek  
ne bi qestîka ne jî bi rastîka.

Rûyê te bêsorav bû mîna siyaseta Silhedînê Eyûbî,  
û porê te dirêj bû bi qasî cildê yekem ê Şerefnameyê;  
sipas ji Xwedê re ku te keziya xwe nehûnandibû li ser du guliyan  
notla cildê duyem ê dîroka şahên sefewî û siltanên ozmanî.

Faykeyê te bi rengê bişkovên dara sêvê;  
çavekî te li axaftinê bû û yek li revê,  
ne wê gavê,  
ne jî nîvê şevê,  
di wê hişyariya hera zîz de  
min tu hembêz nekirî  
ne bi qestîka ne jî bi rastîka.

Vê berêvarkê  
hema ewqasî mayî di hişyariya min de;  
piştî ez çik rabûme ser seriyan  
û min qulopanîkî xwe gêr kir xewê.  
Êdî min şîv xwar û beziyame destşokê,  
nûçe xwendin û bi zorî xwe gihand serşokê,  
lê Xwedê kir ku min ev helbest nivîsand  
û piçekê bi ser hemdê te de hatim,  
bi du bihustan ji semtê xwe dûr ketim.  
Niha dîsa hişyariya min giran dibe,  
û ez ê xewa cinabetiyê biterikînim  
da ku şeytanê taxa we bi min nekene;  
ez ê paceyê vekirî nehêlim ji xewnê re,  
û ji bo xatirê dîdara te ya mîna filmeke bêdeng  
ez ê çend peyvên tehlovanckî hîn bibim ji ilmê çep.  
Nizanim gelo hêvî heye ku bi axivî bi zarê xwe yî şirînovanckî  
ne bi qestîka, lê bi rastîka?

Nayê bîra min,  
ma sewada te hebû bi nameyên kêlekşewitandî  
û te dikaribû peyamên min ên gilêkirî bixwendana  
bi alfabeya Masî Soratî  
-berî ku Ibn Wehşiyeyê Nebetî bide şewitandin  
bi destî çend menceñiq û zindîqên emewî  
zanyariyên min ên li ser bîrên avê û rezên tiriyan-?  
Tu bidî xatirê Xwedê,  
îşev dîsa werî hişyariya min!  
Danê sibehê diçime ser xewa jiyanê,

melûm e, debara zar û zêçan xeyda stûyan e  
û divê hişyariya xwe ya şevan  
biguhêzim kombenda karsazan  
li gorî rêziknameya zagonsazan  
ne bi rastîka, lê bi qestîka.

Gava tu hatî, ji nişkê ve were!  
Axzûma kembera min bi terzê dagirkirina Efrînê veke  
wisan hovane, wisan bêpiyarî, wisan bi vîndarî;  
şalê min vajî ke û virvirkî biavêje  
ber bi navçêmka Amûderya û Serûderyayê.  
Kurtikê min î teng veçîrçîrîne û zîvalzîvalî bike  
heta serfêza sîngê min î sar î mîtanî Elbûrzê Alanê;  
ne bi kubariyê, lê bi kîndariyê.  
Gez bi gez fenanî şoreşeke mafdariyê  
ji tarê bervejoj hilkişe  
bê îskeîsk, bê gazind û bê horeror!  
Gav bi gav eynî mînanî şerê azadariyê  
rake wî şûrê bêmor;  
ne bi qestîka, lê bi rastîka.

Lê lê dînê,  
dewleta min û te bi kîndariyê ava dibe  
bi kîna sal û meh û rojên hesretê,  
bi kîna saet, deqe û çirkeyên wehşetê,  
bi kîna tajan û êşên firqetê;  
êdî serobino bike dengeya dehşetê  
bipelixîne bi wî mêkutê serhesin î destîdar  
ew mêkutê ku hûn jê re dibêjin mîrku.   
Welleh, billeh, telleh, rastîka rastîka!

De dev berde ji paç û maçîka!  
Me asta evîndariyê ji mêj ve derbas kiriye;  
li ser kebînê gelek civan û meşq gerandine,  
ewqas sîxur û desteyên hevdiîtinê şandine  
û çend salan dengê xwe devgem kiriye bi qestîka;  
lê nebû tişteki,  
û rast derneket tilisma tu nivişteki  
ne bi qestîka ne jî bi rastîka.

Êdî bes e ku ev ne hewes e,  
armanca jiyankê ye,  
doza du dilên zindî ye  
çi bi qestîka ji bo amadebaşiyê  
çi bi rastîka ji bo dilperoşiyê!

12.08.2023; 01:46  
*Buxaresta Romanyayê*



## 15. Bi şîretên şîretdarên dilorînîm vê helbestê

Nûçeyekê îro bala min kişand;  
mêrikekî porspî digot:  
*"Êdî helbesta kurdî hilatiye, lê ez î pîremêr im  
û rojên xwe yê mayî bi ziyansîrsiyê dibuhêrim;  
ji bo min dîrok  
mîna qîlpîkeke genî ya piştî xwarina sêrûnê ye,  
û di hişê min de morîstanek debara zivistanê dike,  
lê dev û lêvên min jidil dibêjin:  
Xwedê dawîya me xêr bike."*

Îro kesî nebihîst nûçeya min a hera giring;  
bi rastî tu navendeke ragihandinê bûyera min neweşand,  
ne serinca serokên sererd û binerdan rakêşa liv û tevgera min  
ne jî dilê min ê hertim berpîrsiyar êşîya  
bi gazinca binokên çik û vêl.

Dev jê ber de lê!  
Ji te re çî kar û barên serok û binokan!  
Ji te re çî ker û barên navok û berokan!  
Tu guh bide min,  
dest bide ser sîngê min  
û li benda gotina min bisekine!

Va ye dest pê dikim:  
Berî ku ji te hez bikim, min ji xwe hez kir;  
piştî min dil bijande hezkiriyên xwe  
û tu hilbijartî ji nava refeke keçên çê.  
De bibêje ka min qenc kir an xera kir?

Betir pêr  
min di tenêtiya xwe de hişyarî û serxwebûn nas kir;  
lewre pêr di çavên te de bûme mêrê çê,  
duh te bi xwe nav li min kir,  
îro jî bi devkî ragihand  
û got: bavçê, apçê û xalçê.

Ji sibehê re Xwedê mezin e,  
û ji dusibehê re dem û dewran mêzîn e;  
lê tu niha guh bide şîretên dê-bavan,  
ji ber ku heta dawîya rojê tu dê qanî bibî  
û bibînî ku ew tenê dilsoz û xêrxwazên te ne.  
Bi rastî beriya ku tu ji min hez bikî,  
wan ji min hez kir, navê min mezin kir,  
wan ji te re dorhêleke paqij amade kir  
û tu bi komeka wan derketî pêşberî min.

Xêzkirina nexşeyan gelekî dijwar e hevalê,  
û tu nizanî delalê,  
ew dê kengê pêwîst bikin  
li kîjan dîwarê kîjan rastiyê.

Roja ku dê û bavan em her du anîne ser maseyekê,  
min fêm kir ku bi çi kul û zehmetiyê  
xêz bi xêz hatiyê neqîşandin  
da ku bibî rênexşeya min  
bi qurbankî û bêbergind hatiyê bexişandin.  
Niha çavekî min li te û yek li rê ye;  
li kujiyê her kuçe û kolanê tabelayek hatiyê mixkirin,  
û bi vî awayî pê dihesim ku çi diqewime li vî dêrisî:  
ragihandin û çapemeniya hevsarkirî,  
xîretkêş û mêrxasên bi debara salê kapkirî,  
keç û dayikên li salona ciwankariyê tewilandî,  
maf û dadweriya li pêşberî Xwedê û civakê sihirandî.

Bûyera min a hera giring a rojê ev bû;  
-hema bi gotineke reşekurmancî-  
ev hest, ev raman, ev helwest û ev helbest bû.  
Nehêle ku ez rawestim, binivim  
û nehêle ku pîla saetê minexetiyekê bike!  
Dîsan bibêje û biniçîne min:  
*"Keftar û çeqelên xewê  
li te dipên ku ji ser cendêk vekîşî!  
Şêro! Te vexiste erdê ew nêçîr  
û raxiste dîrokê lehengiya xwe.  
Kelax û bermayeyê biavêje ber şepalan;  
bila ew çavên bi xêrnexwaziyê deliyayî  
birijîn ser cama mîkroskopê  
ku çi tovên telaqreşiyê dihewînin."*

Dixwazî henekan bike  
bi devokên tirkmancî  
yan jî bi zarên kurmancî;  
wekî mînak dikarî bibêjî  
bi lêvkeniya xwe ya her car  
an jî lap bi rijdî:  
*"Te yaz kir hozana xwe?  
De ka bixwêne goraniya xwe!"*

18.08.2023; 16:13  
Buxaresta Romanyayê



## 16. Nixamtin, kod û krîpto

Gava roj hate pêçandinê û herikî, wekî holekê kişiya û çû  
gava stêrk damirîn, ji hev vereşiyar û daketin xwarê,  
gava çiya hejriyan, ji zêmîn raqetiyar û bûn leylan,  
gava dest ji malê civiyayî hate berdan, têjika dehmeşî ji pizdanê raqetiya,  
gava hêştir û navgînên barkirî bêserkar, bêxwedî û bê malxwe man,  
gava ajalên hov û dirinde, mirovên kovî û vederkirî hatin civandin,

gava derya fûriyan, bi ser hev da keliyan û tevî hev bûn,  
gava giyan bi hev re zo bûn, her yekî parçeyê xwe dît û kemilîn  
gava ji jina saxî saxî çalkirî û keça tezebûyî hate pirsîn:  
ji ber çi gunehî hatiye kuştin, tepeserkirin û çalkirin;  
gava rûpelên lênûskan û hesabên tomarkirî vebûn,  
gava rûyê esmanan ji dûmanê xuya bû û hate maliştin,  
gava agirê dogehê hate hilkirin, roj bi pêtên êgir hate vêxistin,  
gava bihişt nêzikî merivan bû, her kesî dil bijandê,  
a wê hingê:

êdî her giyanek dizane çi li bendê ye, her kesek dizane ka çi amade kiriye,  
Xwedê bi stêrkan sond xwariye; lê gelean xwediyê stêrkê ji bîr kiriye,  
Xwedê bi sipêdeyê sond xwariye; lê gelean jiyanê şereş tercîh kiriye,  
Ev Quran peyama qasidê qenc e; qencyê dike û tenê gazî qencîkariyê dike,  
Ew qasîd hêz û hêviya xwe tenê ji qudreta Xwedê hildide,  
Ew Xwedayê ku bi ferman e û hezkiriyê bawermendan e,  
Baldar be, ev pêxemberê ku hevaltiyê bi we re dike ne dîn û şê e,  
Vî pêxemberî li esmanê geş Xwedê û milyaketên wî dîtine,  
Ew ne temahkarê veşartina tiştên nehîni ye, karên nepen nake,  
Gotinên wî naşibihin şeytanê naletkirî û hevalbendên wî,  
Hûn ber bi ku dimeşin, armanca we ya ji vê jiyane çi ye?  
Ev Quran hişyariyek e ji bo gel û neteweyên cîhanê ye, ji bo Neteweyên Yekbûyî  
Herwiha ji bo her çi kesê ku dixwaze li ser rîya rast bimeşe.  
Lê hûn bi xwe nikarin bixwazin, heta ku Xwedayê alemê nexweze.

*Ji romana "Hêvî û Têkoşîn"ê, Hezîrana 2018an, Veliko Tarnovo/Bulgaristan*



## 17. Senaryoya Fîlmekê

Ger derhênerek bûma  
min ê fîlmeke wiha bikşanda:  
Helbestvanekî kurd  
havînekê  
tevî komeke çiyager  
derdikeve lûtkeya Korekê.  
Dema ku çiyager dadikevin xwarê  
ew xwe egle dike û li wir dimîne.  
Mebesta wî ew e:  
li bin alaya Kurdistanê ya mezin  
hemû alayên kurdan ên biçûk biçikîne.  
Dikeve çadira xwe  
û ji termosê avê îskanek av dadigire;  
lêbelê ji nişkê ve best lê radibin,  
ava termosê bi rijdî digire,  
firekê li ava xwe dixwe,  
û heyfa wî pê tê.  
Helbestekê dinivîse;  
lê nikare ristan biqedîne.  
Ji çadirê banzdide derve;



lê bêhna wî diçike û nikare hilma xwe bistîne.  
 Lewre qefesa xwe vedike,  
 êdî bi germê nahese ji kerban.  
 Ber bi bakur li Çiyayê Agiriyê û Elegezê dinêre,  
 Komara Agiriyê û Kurdistanê Sor tên bîrê,  
 Payîzava û Laçîn êdî xuya nakin.  
 Dua dike bi neçarî:  
 Xwedao careke din berê me nede Çiyayê Agiriyê bi zar û zêçan!  
 Me biêwirîne li gund û bajarên wekî mirovan!  
 Xwedao careke din berê me nede welatên tarawgehên!  
 Me ji hêz û rêza me mehrûm neke!  
 Berê xwe dide rojhilatê  
 Keleha Dimdimê û Mehabad xuya nakin  
 Lavayî dike bi neçarî:  
 Rebî bi kêfxweşiyê demkurt me şa neke!  
 Rebî bi serxweşiyê demdirêj dijminan li me raneke!  
 Berê xwe dide rojavayê  
 û Deryaya Spî xuya dike.  
 Şikir dike bi kêfxweşî.  
 Di wê navberê de hevalên wî digihêjinê hinda wî  
 û dipirsin bê ka çima li vir maye.  
 Bersiv dide bi dilnizmî:  
 Li serê vî çiyayê bilind qêriyam  
 û min gazî Xwedê kir:  
 Rebî mirov wekî mirîşkan tên serjêkirin bi destê mirovan  
 Rebî dewlet şer dikin li ser bacên kexane û piyangoyan  
 Rebî erd û esmanên Te têra me gişkan dikin  
 Rebî bibihîze qajewaja zarokên li zindanan tecawizkirî  
 Rebî bibihîze hawara jin û keçên peymalekirî  
 Rebî bibîne sebra şêremêrên li qefesan zincîrkirî  
 Rebî bibihîze qîrçe qîrça li ser bajarên wêrankirî  
 Tu bidî xatirê yekîtiya Xwe ku me yek bikî.

*Ji romana "Hêvî û Têkoşîn"ê, Gulana 2018an, Veliko Tarnovo/Bulgaristan*



## 18. Şevnameya biyanistanekê

### I.

Çend nameyên te bi destî penaberan ghiştin min.  
 Çend heb jî di nava kel û pelên xeniqiyên de  
 ketin destê sîxurên biyanî.

### II.

Di nameyekê de te gotibû:  
 Benîştê dagirkeran di devê xulaman de pûç nabe.  
 Herwiha te dîsa gotibû:  
 Evîn li şevbihurkên rebenan êşbireke demkurt e.

### III.

Di nameya dawîn de jî te agehiyeke balkêş dabû:  
Li wargeha bav û kalan erd û esman talankirî ne,  
li bajarê ku tu lê yî, -dibêjin- diz û keleşên me disitirin.  
Destên serok û giregiran nagihêje wan.

### IV.

Min di bersivekê de gotibû:  
Ez ê rojekê werim:  
dibe ku edetî ereban bi nîv-saetê bi derengî  
ji ber ku saeta min a japonî li rawestegeheke wan hate dizîn;  
dibe ku edetî cotyaran bi çend deqeyan berî berbangê  
hişyar bibim ji xewa şirîn  
û zû bigihêjim wir bi riya jorîn.

### V.

Di bersivekê de jî min wiha gotibû:  
Rûne li xaniyên bê xwedî û şênî,  
bila çavên te bobelatên çûyî nas bikin;  
ez ê jî dapelim ser taximê sîng û berên şeverişan  
ji hingilên komkujiyan poşmaniya dijminan didoşim.  
Tu rûne li wir, ez dê werim.

### VI.

Di bersiva dawîn de  
min bi qewlê mêrê berê soz dabû te:  
Ez ê werim, dev berde ji diz û keleşan.  
Ez ê werim hêviya xwe bibire ji serok û giregiran.  
Jixwe her du jî du tîmên rikeber in;  
piştî lîstikê destebirak û kubar in.

### VII.

Bawer bike ez dê werim;  
wekî te birçî bimînim,  
wekî te bistrêm û bilorînim.  
Jixwe karê evîndaran e stran û lorîn.  
Jixwe karê birçiyên e azadî û serxwebûn.

*Ji romana "Hêvî û Têkoşîn"ê, Hezîrana 2018an, Veliko Tarnovo/Bulgaristan*



## 19. Strana xwedêjêrazi Gavanê Kurd

Weylê dinyayê ez Gavan im, ez Gavan im;  
Bajarê min Sard e, ji qewmê kurdan im,  
Hevalê sed û bîst û çar hezar sehabiyên im,  
Hevqederê Selmanê Pak, Suhêbê Romî, Bilalê Hebeşiyên im.  
Azad ji diya xwe hatime vê cîhana xopan,  
Bi destî sextekarên ayîna Brahîmî li bazaran firotan im.

Rojek ji rojên Xwedê ku hesabê wan nizanîm,  
Min bihîst ku pêxemberek hatiye, ez jî li wan deran im,  
Dibêje ku neviyê Brahîm Xelîlullah, kurê Evdillahê haşimiyan im.

Weylê dinyayê ez Gavan im, qurbana wan rojan im.  
Min qeyd û zincîr şkandin da pey gaziyê,  
Li dîwana Pêxember eleyhiselam rûniştîm bi şanaziyê,  
Guh dan şîret, exlaq, şerîet û mexaziyê.  
Heta wê çaxê kesî navê me nekiribû teraziyê,  
Lê cenabê wî navê me tomar kir bi pîroziyê,  
Kurd rizgar kirin û em derxistin serfiraziyê.  
Weylê dinyayê ez Gavan im, qurbana wan rojan im.

*Ji romana "Hêvî û Têkoşîn"ê, Hezîrana 2018an, Veliko Tarnovo/Bulgaristan*



## 20. Strana xwedêjêrazi Meymûnê Gavên

Lo Meymûno, navbixêro, peyamê bişîne bajarê Besrayê  
Gavanê Kurd ji bajarê Sardê ber bi Mekkeyê bala xwe dayê  
Roniyeke şemal dide ji Girava Ereban ber bi Şam û Bexdayê  
Bû pîrê fanî, kete riyan fenaî rêwiyê Beytullayê  
Xwe gihande koma haşimiyan bi misilmantî dil dayê  
Ji wan re got ez kurd im, navê min tomar bikin bi tevayê  
Ez ê bibim hevalê sed û bîst û çar hezar stêrkên hewayê  
Lo Meymûno hez bike Ehlê Beytê bi xatirê Bavê Fatmeyê

Lo Meymûno, navbixêro, peyamê bişîne Kurdistanê  
Bibêje me navê kurdan qeyd kiriye li deftera dîwanê  
Werin bi xêr û xweş lê xwedî derkevin ji dil û canê  
Welat û bajarên xwe biparêzin, vala nekin meydanê  
Pêxember eleyhiselamî azadî bexşandiye cîhanê  
Tu carî stûyê xwe xwar nekin li ber wan dîwaranê  
Bibin pêşengê alaya îslamê heta dawiya dewranê  
Lo Meymûno bi kewserê biratîyê bînin teveka Kurdistanê

*Ji romana "Hêvî û Têkoşîn"ê, Hezîrana 2018an, Veliko Tarnovo/Bulgaristan*



## 21. Helbesta tevlihev a Apê Cihangîr

I.  
"-Bi navê Ellah dest pê dike her karê qenc  
Bi penaha Wî dawî dibe êş û renc.  
Silav ji Cenabê Muhammed re digel malbata wî  
Rehmet li xwendevanê vê helbestê û guhdarê wî."

## II.

"-Feqiyê Teyran li ser te nivîsî destanek ey ava delal,  
ez ê çî bibêjim ey ava zelal,  
ey vexwarina hera helal!  
Piştî destana mamostayî dev û lêvên min goristanek;  
kêmasiya xwe çawa vebêjim ez ê kerr û lal?  
Êdî em ji çavkaniyên te dûr ketine;  
bi lûle û şûşeyan têyî ber me,  
şîreşira te naşibihe xûlexûla te ya surîştî.  
Li ser te şer û siyaseta dimeşin  
û haya kesî nîn e ku şer biryareke jiyaniye:  
Bi rastî gola xwîne ye ku giyanên gelek şervanan tê de dixeniqin.  
Bi rastî kedekê civakî ye ku her kesek misteke jiyana xwe diavêje navê.  
Dibe ku şer welatekî tar û mar bike,  
kêvir li ser kêvir û sêrî li ser cendêk nehêle."

## III.

"-Paqijî bi "Av" a Feqiyê Teyran e seba edebiyatnasekî,  
bi "edalet"ê ye seba serwerekî,  
bi "xîret"ê ye seba berxwedêrekî,  
bi "dildarî"yê ye seba dengbêjekî.  
bi "destnimêj"ê ye seba misilmanekî."

## IV.

"-Misilman dibêje: "Heft cureyên avê hene:  
Ava baran, derya, çem, bîr, kanî, berf û zîpikê."  
Dengbêj dibêje: "Tek regekî dildariyê heye  
û hezar cureyên tengezariyê."  
Berxwedêr dibêje: "Her roj roja xîretê ye  
û her der meydana berxwedanê."  
Serwer dibêje: "Pêşiyê li dijî xwe adil be;  
tu ji her kesî zêdetir muhtacê edaletê yî."  
Edebîyatnas tiştê nabêje derheqê avê de,  
li gorî wî av pîroz e, rê û resmên miameleya wê diyar in  
û lewre divê şagirt bi meşq û bêdeng noqî wê bibin."  
Gava av nebe, gotî meriv lê bigere  
bêyî wê heyat ne mumkin e, ne ku zor e.  
Dibe ku bi kevîrên qûnê îdare bikî heta demekê;  
lê dîsa jî gotî meriv xwe bigihîne avekê.  
Li Kurdistanê av pîr e;  
lê dibe ku dijminêkî xwemalî yan jî dereke  
bi ser te de avê bibirre.  
Loma gotî çavkaniyên avê ewle bikî,  
seba ku gelê xwe bi pergal û dewlet bikî.  
Ji bo pergal û dewletbûnê,  
divê tu hunera şer û aştîyê bizanibî.  
Heyat bi xwe geh şer e geh ceng e ji bo her kesî."

## V.

"Çima mirov ji bihuştê hatiye qewirandin?"

Ma ne bi handana Iblîsî bû,  
ma ne ji xwarina mêweyê darê bû,  
ma Adem û Hewa rût û repal nemabûn,  
ma nehatibûn cihanê ku şerê Iblîsî bikin?  
Min çendîn carî bihistiye ku feqîh û mela dibêjin:  
"Gelî xwişk û birayan!  
Qedrê avê bizanibin  
û gemarê bernedine nav ava rawestiyayî.  
Qedrê daran bigirin  
û ber-binê wan gemar nekin.  
Li ser û berê riyân,  
li cihên qûze, talde û sîwanan gilêşê nehêlin.  
Xwe paqij bigirin  
û di kunên ajalan de mîz nekin.  
Li ser destavê neaxivin,  
Li zevînê servekirî  
ber û piştta xwe nedine tav û hîvê  
û mîz nekin.  
Herwiha gava hûn li ser destavê bin  
ber û piştta xwe nedine qibleyê û bayî jî."  
Min çendîn carî bihistiye ku sofî jî dibêjin:  
"Gelî xwişk û birayan!  
Guh bidine qalikfiroşan  
lê dîsa jî werin cem me kakilfiroşan!  
Rast e, gotina feqîh û melayan;  
lê dilsaxî û giyanpaqijî jî pêwîst e.  
Kesê ku gotin, kirin û hizra xwe zelal bike durist e."  
Pirsa min ev pirs e:  
"Gelî sofî û meleyan!  
Em çima hatine vê cîhanê,  
Ma bi Iblîsî re nîn e cenga man û nemanê?  
Heke we got 'na',  
ji xwe karê min bi we neketiye,  
ez ê bikim xebera Quranê,  
we bihêlim wekî segê zimandirêj  
ku bi hilkehilkê hilma xwe berdide.  
Heke we got 'erê',  
wisan e lêkolîn û xebatê bikin,  
ji bo cenga li dijî Iblîsî pergaleke xurt ava bikin,  
çi ji destê we tê kêmasiyê nekin,  
şerê digel wî melûnî paşguh nekin  
û bawer bikin  
ku wî soz daye Xwedê  
da ku bi rijdî şerê we bike.

*Ji "Bajarê piştî tifebaranê" (kurteçîrok, 2019-2023)*



## 22. Çi me ez? (werger ji Dr. Eliyê Şerîetî)

Di hembêza sed dek û dolabê de efsaneyêke bêdeng  
ji işweya bayê hênîk, toza dek û dolabê xwarî  
li pişt her derdê kenekî, dijawariyêke razayî  
di dilê şevên daristanekê de, razeke veşarî.

Çi me ez?

Feryadên berz bi zincîrê girêdayî  
nêrîneke sosret a dînîtiyekê, a tev li bîranînan bûyî  
jehra dawerivî, ji bin diranê sed umîdî  
dijûna nizm a ji devê qehbikeke nebaş a rojgarê ketî.

Çi me ez?

Bermayeyê karwanê sivikbar ê daxwazê  
xwelî û ariya li riyekê  
çivîka derbider a ku riya hêlînê windakirî  
di şeveke tarî de.

Ez çi me?

Lekeyêke şermizariyê li pêşa jiyane  
ji şermizariya jiyaneke aloz a tûmanekî  
nalîneke şkestî di gewriya bêkesekî  
raza negotî û sirûda nexwendî.

Ez çi me?

.....  
.....  
.....  
.....

Ez çi me?

Devbikenê pir melûl ê payîzeke rofirînê  
di lêgerîna şevê de ...  
Pûsiyêke ku ketiye ber lepê şeva jiyane  
bê nav û bê nîşan  
dilxwazê dîtina tava mirinê.

*Ji romana "Lênûska muflisekî eşqê" (2023), destpêka nivîsandinê: 2019, Bazîd*



## 23. Lavahiya kurdekî

Xwedayê min!

Tu bi bidî xatirê navê Xwe yî mezin  
û navê me di duayekê de binvîsî  
li ser hesînê dadweriyê yî ku tu carî natewe.  
Tu me bêpar nehêlî ji desteka wehya pîroz,  
ji peyrewiya Cn. Muhemed 'eleyhiselamî

û me bi ezameta navê Xwe bi kêrî karekî bînî.  
 Tu navê me di eniya ehlê înkare de bikolî  
 heta ku bizanibin em kurd ayeteke Te ya bêpayan in.  
 Xwedayê min! Navê me hetanî erşê Xwe yî berz bilind bike  
 û li ser zevînê tav û hîvê binivîsîne.  
 Tu me di bin baskê Cibrayîlî de xwedî bike,  
 desteka bayê Mikayîlî ji me re bişîne,  
 hêza nefesa Îsrafilî bide ber dilê me  
 û me bike qamçiyê de destê Ezrayîlî.  
 Xwedayê min!  
 Da ku em bi sîreta pêxemberê Te gilêyan vekin,  
 bi izeta xwe ve duayê bikin,  
 ji bo rûmeta xwe hewariyê bixwazin,  
 spasiyên xwe ji dil û can bikin,  
 ber bi serfiraziyê ve koç bikin,  
 bi baweriyê xurt mafê xwe bistînin,  
 barê xwe yî giran ji erdê rakin,  
 ronahî û nûrê bibînin,  
 erdê bigihînin esmên,  
 û di tofanê de  
 bi nasnameya xwe ya kurd ve li keştiyê siwar bibin.  
 Di roja meşerê de bi dilniyayî şiyar bibin ji xewa mirinê,  
 giyanê xwe tenê ji bo Te bidin û radestî Te bikin.  
 Heta ku Tu ji me razî nebî  
 wateya xwe nabîne bendetiya me.

*Ji romana "Lênûska muflisekî eşqê" (2023), destpêka nivîsandinê: 2019, Bazîd*



## 24. Straneke rexneyî ji bo siltan Silhedînê Eyûbî

Helay, helay, helay. . .  
 Silho lawo, piştî te gelek şer li me qewimîn,  
 Welat wêran bû, xew li me herimîn,  
 Zarok sêwî man, dîlan û govend teribîn,  
 Xuristan, Aran û Luristan ji ber çavan heyibîn.  
 Min ê nego merî lehenga mîna te xweyî nake;  
 Merî lehenga xweyî dike, mîna Kawayê Hesinkar.  
 Te çima lehengên Luristanê li cem xwe kom kirin,  
 Şûr da destê xulaman, neyar wisa şad û şûm kirin?  
 Hey mêrxasê li hemberî file û xaçperestan!  
 Hey fermandarê umetê, mêrê roja karesatan!  
 Te çima egîtê mala bavê min kom kirin ji deriyan,  
 Bi erzanî da xêra dê-bavê xwe û sedeqeya seriyan?  
 Heywax hewar dikim, hewar nayê; hey dil gazî dikim, gazî nayê.  
 Dayê dêranê çima deng û pêjn ji warê Lur û Bextiyariyan nayê?

Helay, helay, helay. . .  
 Silho lawo, piştî te gelek rojereş li me qewimîn,

Welat dîsa ava bû, konên zilmê dîsa hedimîn.  
Xanedana Zendî konê bavê min vegirtin,  
Dad û maf li ehl û xwediyan spartin,  
Bû şingîniya şengesiwaran, welat hingaftin;  
Lê Feth Eliyê Zendî ciwanşahê luristanî,  
Rast hat li mixeneta lawê şevederê;  
Lê dîsa jî şûrê lahorî nekire kalanî,  
Rojên oxirmê giran qira Qeceran anî.  
Heywax hewar dikim, hewar nayê;  
Hey dil gazî dikim, gazî nayê;  
Hewar gihiştîye perê esmîn, Xaliqê Alemê,  
Gazî gihiştîye mezhebê, Malbata Fexrî Alemê.

Helay, helay, helay. . .  
Silho lawo, ez ê doza te betal kim, welleh ez ê betal kim,  
Wez ê kurdan nekim qurbanîyên doza xelqê, helak nekim.  
Doza umetperweriyê em bêwar kirin, ez ê mîna te nekim.  
Wez ê Xuristan, Aran û Luristanê bê şûr û mertal nekim.  
Wez ê dilê Kurdistanê ji hemû kurdên cîhanê re vekim.  
Heke dilê Kurdistanê têrê neke, ez ê dorê lê fireh kim.  
Heta bigihêjim lûtkeya jordestiyê û bindestiyê jî pêpest kim.  
Heywax hewar dikim li tevahiya dinyayê;  
Hey dil gazî dikim li umeta Bavê Fatimayê;  
Hewar gihiştîye perê esmîn, Xaliqê Alemê,  
Gazî gihiştîye sazûmana dewletên alemê.

*Ji romana "Lênûska muflisekî eşqê" (2023), destpêka nivîsandinê: 2019, Bazîd*



## 25. Neyê xewna min ji kerema xwe!

Lap nivê rojê ye li vir, germ e, germistan e  
û min dil heye piçekê binivim bi ser kulan re;  
lê ewrê saw û sehmeke girtiye ser tepa serê min  
ku ji nişkê ve bêyî xewna min,  
siha te bikeve ber tava dadweriyê  
û dozên mafdarên taloqî serdema Mehdîyê Mintezê bin.

Belê, neyê xewna min, neyê!  
Dibe ku te helbesteke Ciziriyê dixwend  
berî çend kêliyên li ser çirkeyan dabeşkirî  
û gava bêyî xewna min di vê rewşê de,  
dibe ku zilfên te bikim hêlekan  
û risteyên xwe yê herî zarokane tê de bihejînim,  
ji ber ku xijexija radyoyên wan çaxan  
loriyên dayika min ditepîsandin kuncikên tarî û qulên dîwaran.

Belê, neyê xewna min, ji kerema xwe re neyê!  
Dibe ku tu teze ketibî govendeke derxistina bûkê



û bi neçarî dilîzî li ber straneke cizîrî ya berzeq  
ku stranbêjî bêyî hemdê camêriyê digot:  
"hao hao, min xaltîka diya'x gao!"

Tu bidî xatirê vê nîvroya zivirerûnkî qijirî  
û wê hêrsa xwe ya ji peyva exlaqî sincirî  
ku neyêyî xewna min vê nîvroiyê!  
Min karê pût û seneman, xet û xalan spartine zêrevanên edebiyatê  
wekî ku te helbest û peşanên min avêtin ber diranên çapxaneyekê.  
Bila ewqasî dengbêjên rûniştî  
li ser taximên sîng û beran galegalê dirêj bikin,  
bêhna rûmetê biçikînin li nîveka dilî,  
li bin banê malên hilhilî  
li ber hêşiya konê bi mêvanan xemilî  
û li navenda hoz û civatê!  
Îcar ji min re çi?

Min rehet bihêle vê nîvroiyê  
û neyê xewna min ji kerema xwe  
da ku dema nîvroiyê ji rehetiyê re bimîne  
û xewna min a şevan li benda te bimîne.

26.08.2023; 14:51  
Buxaresta Romanyayê



## 25. Xwedê xêr ke dîsan!

Xwedê xêr ke, çavên min rê dikişînin dîsan;  
ji ber ku pîremêrekî bi çavên kelogirî  
qala silaveke pêwendiyê dikir:  
*"Em tût û rût  
bi tena serê xwe tîn vê cîhanê  
û bi tena serê xwe dimirin  
li vir an jî li dera hanê.  
Di navbera vê hatin û çûyînê de em  
pergala jiyaneke demdiyar diperitînin,  
çavên me hertim riyekê dikêşin,  
em li benda tiştêkî ne û bi tenê,  
bi pîbarî dixwazin silaveke pêwendiyê  
û degme caran digihêjin vî mirazî."*

Xwedê xêr ke, hişê min hestiyar vedikayê dîsan;  
ji ber ku kedkarekî bi diranên çirikandî  
qala dostaniyê û hevalê dilsoz dikir:  
*"Em bi deftereke deynan teqawid dibin;  
sermayeya me qelem û jêbirek e  
geh xêzekê dikêşin ser mezaxtinên bêveger  
geh nîşeyekê dinivîsînin li kêleka navê kesekî."*

*Her xanenişîn li benda dostanî û hevaltiyekê ye;  
ji ber ku dostê roja teng û hevalê dilsoz  
samana rasteqîn a jiyaneke bextewar in.  
Nas û kêmnas hene,  
bêhna xwarinê hildikin û xwe li aşxaneyê digirin;  
heta ku qasik û legan hebin rêhevalên şahiyê ne,  
roja ku xwarin qediya vedigerin pêşniyara Mencenîqî  
û bi helwesta gumgumokê distrên felsefeya zindîqî  
da ku agirê tunetiyê geş bikin  
ji bo pehtina qeyxaneyeyeke dilmeyî.  
Îcar heval û hogir jî hene,  
bêhna şewatê hildikin û radihêjin hewariyê;  
drevine cihê bûyerê ji bo agirkujiyê,  
avê dikêşin bi dilsoziya margîseyê  
da ku êgir damirînin bi barê devê xwe,  
ji ber ku heyfa wan bi Brahîmî tê.  
Gava ev dost û heval diheyibin ji ber çavan,  
tu bêriya wan dikî bi tevzî û ricafan  
wekî ku hişê te vekayê hestiyar."*

*Xwedê xêr ke, gulpegulpa jena dilê min e dîsan;  
ji ber ku helbestvanekî bi kulmên şidandî  
bangî baweriyê dikir li çolistana hêviyan:  
"Tu dê kengî bişînî bûka azadiyê  
derveyî nizamnameya yenîçerîtiyê  
digel çil û çar cêriyên demokrasiyê?"  
Lê milyaket nedixuyan piştî kutabûna wehyê;  
lewre bi xwe bersiv dida banga baweriyê:  
"Reng e piştî derewên xweşpînekirî yên umetê,  
reng e berî xap û kapên herî berk ên dewletê,  
reng e di navbera gilî û gazindên sêdarekirî yên civakê,  
reng e bêyî raman û bendewariyên bêneseb ên kesayetê."  
Piştî dibû ringeringa siman û teperepa piyan;  
gelo karwan dibihurîn ji Riya Hewirmişî  
gelo şivan û gavan dibihurîn bi naxir û keriyar  
yan hêzên ewlehiyê desteser dikir navnîşana berxwedanê?  
Lewre ji nişkê ve vediciniqî cizbeyeke Memiyane:  
"Ez nas nakim tu serek û navik û binikî!  
Warê min li navbera <bûyîn> û <kirin>ê ye;  
mîna dengbêjan mereq nakim taximê sîng û beran  
bawer nakim bi xala gerdanê ya sofî û derwêşan  
hilnadim îşqat û sakoyê miriyekî mîna feqî û melayan  
tehm nakim henara pêşîn a Zîna Zeydan,  
nanoşim meya hengebîn a derdkêşan.  
Ez tenê helbestvan im;  
bi tenê hestên xwe dizanim,  
bi tenê teşkilata zimanê xwe dizanim  
û li benda fermanên wijdana xwe me.  
Ma ez dizê hevok û risteyên xwe me jî?"*

01.09.2023; 01:13  
Buxaresta Romanyayê



## 26. Ax pišta min!

Min î pala xwe daye çiyayê helbestê,  
guhan bel dikime strana “Şirîna min” ji Almastê,  
dipokînim li ser ciwaniya şeng  
û dikim rabime dîlanê bihest-bêdeng;  
lê pišta min diêşe ku diêşe.

Nizanim ev çi îş û êş û ûş e  
ku girtiye movikên pišta min  
û serê min jî çima li çol û çiyayan digere?  
Herhal li şeveke Xizireylazê digere serê min ê hizirhez,  
diçe seyranê digel hewariyên Eysa Mesîhî revebez,  
û destexaneke mizgîniyan radixe peravên Gola Sevanê  
di navbera Elburz û Elegezê de;  
lê tiliyên min  
bi şandina selfiyekê re mijûl in  
ji bo evîndara min a li Kerkûkê.  
Şerîet şermê naxwaze ku hewramiyek e ew  
û ez jî kurmanciya navendî û xwarê nizanim;  
loma notlanî kerr û lalan destopiçko û bi wênayan pê re diaxivim,  
loma kiteke solên min bi ro de diçe bi ser Dijleyê re û pê nahesim.  
Hinek dibêjin şivanekî feylî kita solê dîtiye li Wasitê,  
hinek dibêjin gavanekî şebekî ew girtiye li Mûsilê  
û hinek jî dibêjin “*li ber mekeve lo, ser û binê wê kiteke solan e!*”;  
lê dilê min dibêje ku “*ev îşareta Xizirî ye, herka avê bişopîne*”;  
lê dîsan pišta min diêşe ku diêşe,  
heta ku bi piştêşa min dihese Perxane û Şoman,  
heta ku bi dubeytiyan newaya min dilorîne Luristan.  
heta ku bi mişt sêxiştîyan şûrê min xişt dike Xuristan.

Lê ka pişt?  
Piştê tu qurbana piştan bî, çima bi jena dilê min ranabî!  
Tu bi tîra Argeşî bigihêjî miraz û armancê, çima ranabî!  
Tu di Cama Cemşîdî de bihelî û bibî şûşe, çima ranabî!  
Tu bi çoganê Xosroyî bikişkişî av û azadiyê, çima ranabî!  
Hema gotinên min hêç mîratê,  
ma stran jî te ranakin xîretê?  
*“Welleh govend ranabe,  
billeh govend ranabe!  
Xwelî li mêrê xirab be!  
Radize hişyar nabe!  
Rûdine qet ranabe!”*

11.09.2023; 21:47  
Buxaresta Romanyayê



## 27. Îro piçekê pak im

Îro piçekê pak im,  
piştêşa min niştiye ser qurmê dareke zeytûnê  
ku li deşta Efrînê dizûre ber bi hafa Xwedayê gerdûnê  
û serpêhatiya çiqilên xwe dinivîsîne li erzehalekê;  
li gorî baweriya van darên bê zar û ziman,  
ji sibehê heta êvarê milyaket hildikişin û dadikevin,  
gazindên bende û mexlûqan digihêjin dîwana erşê ezîm.  
Belê, îro piçekê pak im û guhên min qiriyane  
ji newayên *"şîkî şîkî baba, hecî hecî yaba"*yê  
û vê yekê bextewarî dihesibînim.

Min got ku îro piçekê pak im,  
ji ber ku êşbirran bi kar tînim  
û pêhesîna êş û azarên xwe taloq dikim;  
lê baş dizanim ku ew ê dîsan dagerin  
notla gur, qijik û zîloyên birsî  
gava maweya bandorê qediya  
û min çareseriyêke pizişkî lê nekir.

Di rastiyê de hemû êşên min li zarokatiyê vedigerin;  
êşa pêşîn bi tomarkirina navê min dest pê kir  
li deftereke dagirkeran bi dengên biyanî,  
lê piştî çil salî min navê xwe yê rastîn eşkere kir  
li ser malpereke înternetî  
wekî ku Brahîm Pêxemberê nod salî  
xwe bi destê xwe sinet kir bi tevşoyekî.

Êşa duyem digel tevziyan dest pê kir  
roja ku min pê avête dibistaneke biyaniyan  
û dengê xwe yê kurdî bi ser xatirê mamosteyekî kurdnijad huş kir;  
wan çaxan wî bi huşbûna min zik û berzikê xwe çêrandin  
û min jî piştî çend salan toq û çenberên bînamûsiya wî dirandin  
roja ku li mewlûdeke kurdî çav gerandin.  
Ji wê rojê û pê ve zimanê min î pehn î sorgevez ditevize  
dema ku dengên dagirkeran nas dikin guhên min.  
Lewre gava tif dikim wan rojên jehrtêketî,  
kincên min ên bi terzê ewropî şil dibin  
bi tûka bêpergal pekiyayî  
û şerm dikin şehîdên termneriziyayî  
ji ber min neviyê bêxîret ve.  
Bi rastî ez jî fedî dikim  
û êdî pêrista êş-mêşan dirêj nakim;  
wekî ku min got,  
ez êşên xwe derman nakim,  
lê pêhesîna wan taloq dikim.  
Lewre gava dibêjim ku piçekê pak im,  
ji pertafên nexweşan bawer nekin  
û têbigihêjin ku hê lap pak nebûme,  
hê hê jî gurra wijdaneke peritî nakim

-a ku peritiye ji ber xebat û bikaranîne  
a ku mîna tovê rehekekê pişiriye zevîne  
a ku kêra sorsincirî dide ser devê birîne-.

13.09.2023; 21:25  
Buxaresta Romanyayê



## 28. Bi Zembîlfiroşî re pêşbirk nabe!

Ey dil hilneyê dîsan bêcoş  
Carek ji caran meyê nenoş  
Da nebî mîna Zembîlfiroş  
Were, seh neke hikayetê

Tu pîremêr, ew lawê rewal bû  
Tu xweşhal, ew xwedîeyal bû  
Qurmiçî yî, ew bedewî lî bal bû  
Were, pêpest ke vê qismetê

Tu dilfeqîr, ew dilzengîn bû  
Ew bi evîna Xwedê bengîn bû  
Neyarê te yê yekem jî evîn bû  
Were, bihêle pîşe û sinaetê

Tu hêvîfiroş î, ew selikfiroş bû  
Tu sîtilan dixwî, ew bêbiroş bû  
Tu tolaz î, ew ne tol û berdoş bû  
Were, yarê neke mîna kulfetê

Wî bi destan zembîl digerlandin  
Te ehlê bazarê zehf dizêrandin  
Li kuçe-kolanan mêr dişêlandin  
Were, dagere hiş û ferasetê

Gava selikan tîne, jinek wî dibîne  
Lê her xatûn ji te çavan direvîne  
Dil bernade te, kesek te nahebîne  
Were, nekeve ber pêla muhbetê

17.09.2023; 05:13  
Buxaresta Romanyayê



## 29. Ax ji destê sextekariyê

Ax ji destê sextekariyê!  
Nabêjim tu kesî bi qasî min ji destê sextekariyê nekişand;  
lê heke kişandibe jî,  
temenekî pêncî salî badilhewa neperitand.  
Ez tam bîst û pênc salan qêriyam li navenda Bazîdê  
min gote derdora xwe ya dûr û nêzik:  
Gelî kurdan, heke hûn demokrat bin  
bi kurdî demokrasiya xwe bibêjine min!  
Heke hûn misilman bin,  
bi kurdî îslama xwe bidin nasandin;  
na, heke hûn sosyalîst bin,  
sosyalîzma xwe bi kurdî şirove kin!  
Kesî guh neda min  
û di wî bîst û pênc salî de  
ne misilmanan dînê xwe bi kurdî nivîsand  
ne demokatan mifaya doza xwe bi kurdî ragihand  
ne jî sosyalîstan bîrdoziya xwe li ser kurdî wergerand.

Diyar e ku her kes ji çîrokên xeyalî hez dike,  
jiyana wan di navbera xeyalfiroşî û hêvîfiroşiyê de  
geh bi çand û ziman û amûrên biyanî diçe ser hîvê  
geh ji ber çand û zimanên dagirkeran diqele li ber tavê.  
Ez jî mîna Qis b. Saideyê Iyadî me li bazara Uqazê  
ku gazî Qurêş û erebên rewanbêj dikir:

*"Gelî mirovan!*

*Guh bidine gotarê, têbigihêjin ji bo biryarê;  
gava hûn dibihîzin, jê sûd wergerin, pê nelîzin.  
Her zindî dimire û kê dimire jî êdî dibihure,  
pêşeroj çûye bêveger û paşeroj jî tê bêmefer.  
Li esmanan nûçe û zanyarî hene,  
li ser erdê jî dîtî û ibretgirtî hene.  
Li pey şeveke tiptarî tê rojêke çiksayî  
Heybet bigire ji esmanê bircbircî,  
ji erdê tiştîşî bi rê û rêçikan  
ji deryaya ku pêlpêlî dikişe ava wê.  
Ev çi îş e, çi îşaret e, çi malmîrat e  
ku mirov diçin û êdî qe venagerin?  
Ma ew ji cihê çûyîne razî bûne û li wir mane  
yan hinekan ew tî û birçî avêtine wan deran,  
mirine, birîndar in, di xewa sekeratê de deliyane?  
Çi heyf e ku perwerdekaran ew hînî xewa xefletê kirine!  
Çi heyf e ku desthilatdaran ew fêrî têkçûn û daxwarinê kirine!  
Çi heyf e ku katjimêran ew hînî xew, xwarin, çûyî û mirinê kirine!"*

17.09.2023; 20:53

Buxaresta Romanyayê



## 29. Payîz mêvana zivistanê

Guveguva bayekî derpayîzê ye,  
pîjekî hişk î rehriziyayî  
bûye goga ber piyên vî bayî  
û gogelîsk digindire deştê;  
lê qûç, gir û kêrt hê serqot in,  
pêş û damanên çiyayan çîprût in,  
rût bûne ji hişkegiya û palaxê,  
tu dibêjî qey pêxas in,  
tu dibêjî qey kerî û naxiran  
qirş û qesel gêzî kirine  
ji bo pêşwaziya berf û pûgê.

Guveguva bayê derpayîzê rawestiyaye,  
bestên rast bi şovan sorkewî bûne,  
tu dibêjî qey gewrik ketine rûyên wan,  
deqdeqî û belekbelekî bûne ji tîhnan.  
Di kelegerma havîna bihurî deK  
kanî û avzêmk hema hema miçiqîne  
û tu dibêjî li ser piştê wan agir vêxistine.  
Mar û ziyayên tî bêhêvî ne ji erd û xweliyê,  
serî û stulqk rakirine li şûna dest û piyan,  
derketine duaya baranê mîna şêx û melayan  
û li esmanê Xwedê yî çiksayî dinêrin.  
*"Heke baranek bibariya," dibêjin*  
*"ev mêrg û zevî dê vepesiniyana*  
*bi zîlvedana zîxên çêreyê û ajeroyan,*  
*pêşîr û berpâlên çiya û baniyan*  
*dê keskbelek bûna dîsan ji bo ruhberan;*  
*heta qeramê û heta tevizîna ji sermayê*  
*helbet em ê jî şa bûna bi çiravên cûniyan,*  
*me yê jî debar bikira bi golegeniyên,*  
*û me yê jî tewaf bikira ava çal û kortalan*  
*bi mebesta sipasî û şêkirandina Xwedê."*

Berêvarên derpayîzê  
bayekî sivik dilîrîne saqên kirkor û kerengan  
li kaş û dol û geliyan, li naverasta bestên dûr, li deştên dorvekirî;  
çirçirk hertim tengezar dibin ji vî dengî,  
ji ber ku başebaş nas dikin vî rengedengî:  
ev deng nûçeya nebixêr a zivistanekê ye,  
ew ê êdî def û tembûrên xwe ragirin  
û xwe biavêjin bextê gêrikan.  
Pariyek nan mistek jiyan e wê çaxê,  
vizikên xwînmij dê sazbandiyê biterikînin  
û bi neçarî bibin gubreya axê.

Zivistan destexwişka payîzê ye  
û hinek dibêjin xwişka wê ya hevalpişt e jî;  
lê divê bê gotin ku gelekî fediyok e,  
hem jî mîna pepûkekê xapxapok û kone ye;

notla biharê ne destsivik e,  
bi tîqetîq û hîrehîra ewran nakene;  
notla havînê goreyan naşiqitîne ji piyan hanzûka,  
sîng û gerdenan hênik nake bi av û baweşînkane  
eşkere û bi dizîka.

Ma ne seyr e ku zivistan  
pêşiyê xêliyêke çîlspî dide ser serê bilindciyan  
piştîre faykeyekî ji rîsê sîs li wan dike  
û dinixême qûntaran bi tetqalek berfa kever?  
Bêguman ev ne seyr e,  
lê tiştê sosret ew e ku deşt gazî berfê dikin  
da ku gendeliyên xwe biqerisînin heta derbiharê  
û bi bihaneya sersal û Newrozê  
dîsan wan raweşînin nava jiyane.

Wisane dixuye ku payîz mêvana zivistanê ye;  
xatir xwestiyê ji tava mêjîqirînok,  
suh hatiye ji hemû rût û repalên ber deryayan,  
kizgiriya e û dike ku ji kerba havînê bigirî,  
dike ku ji bo kêfa dîtina zivistanê  
ji çavîyên ewran birijîne baranê.  
Kes nizane gelo çima payîz  
ewqasî hez dike ji bûkaniyan,  
ewqasî dixwaze ku bigihêje mirazan  
destexwişka wê ya zivistan.  
Her çawa hebe, dûr an nêzik  
zivistan dê were,  
dê bi bûkaniya xwe ve were,  
dê bi wî kirasê çiftexas ve were;  
payîz jî dê bi baranan here,  
dê bi pêlên lehî û lêkendan here,  
dê bi hewariya hevalpiştî xwe ve here  
û piştî betlaneya havînê  
dê bi ser xwe de were  
û li dem û dewrana xwe dagere.

19.09.2023; 23:58  
*Buxaresta Romanyayê*



### **30. Sozê me payîz bû û ez nehatim Selwa**

Min di kelegermeke havînê ya Bazîdê de soz dabû,  
û ez ê payîzê bihatama wekî xwezgînekî;  
lê piştî biryarê erd û esman qeliya Selwa,  
min tu veşartî di dilê xwe yê çolistan de  
wekî ku Umerê kurê Xetabî  
keça xwe saxîsaxî çal kir bi çavên kizgiriya,  
lê keça bêguneh xweliya birûmet dadiweşand



ji rihê wî yê xwihdayî bi urfeke kepaze.

Payîz hat û ez nehatim Selwa;  
mîn nedîtin çavên te yên şilavî  
û mirazê te negihişt welatê min ê ewravî  
dema ku tava rastiyê diqijirand li çolistana we.  
Piştî payîzê berf û pûg û qeşayê girt çiyayên me;  
dilê min î birîndar hertim li pey sozê xwe kişkişî bi erdê re  
mîna şervanê ku laşê wî bi derbên tîr û şûran kunkunîbûyî,  
ala û tiving û rext hembêzkirî di mehşera cengê de.  
Ji ber ku hertim li pey sozê xwe dixijikîm,  
birîna min tetqal nedigirt, celcelxî dibû û diaxivî;  
tîştîştî dibû lêvên min ên qirçiqî ji bêderfetiye,  
şivîşivî dibû piştî min a bi deyn û dûyan xûzbûyî  
û te digot qey pisîkên girnehwikî hilkişiyane bi pencirûkan.

Axir nehatim Selwa,  
êdî çi bibêjim jî  
û çiqas hêsiran birêjim jî  
tu dê nebihîzî dengê min.  
Dizanim ku niha dibilîni û dibêjî:  
*"Heyhat ku heyhat, ciwankî soz da û nehat;  
heke pîremêrkî were, dê bibe bobelat  
û ez ê pê nehesim bê ka çawan û ji ku hat."*

20.09.2023; 21:23  
Buxaresta Romanyayê



### 31. Jimaryarê payîzê

Tu gelekî xebitiyî  
û te kedeke bêhevta berhev kir vê havînê;  
de were hesêb bide jimaryarê payîzê  
bê ka te çend kevir avêtin kulînê.

Êdî payîz e, bayekî sivik li derve divîzvîze,  
îşev mêvanên te ne qelem û defter û çortik,  
û li fêza te hilawestî ne findank û avîze;  
de were hesêb bide keçên pakîze  
bê ka te çend kevir avêtin jinkokên kepaze  
dema ku pêşniyazî te kirin gunehên nuwaze.

Tu gelekî mijûl bûyî mala minê hey!  
Tu mîna gêrikan xebitiyî vê havînê;  
de ka were hesêb bide jimaryarê payîzê  
bê ka te çend kevir avêtin kulînê  
û çend caran xwe hilavêt  
li ber reklama titûnê

dema ku nojdarî derman dikir  
mubtelayekî ziqûma titûnê.  
Erê lê, ev jimaryar naşibihe yên din  
tenê hesêb nagire,  
wihareng berawird jî dike  
tewaxa hêsin li ber holepîtkên hêtûnê.

20.09.2023; 21:59  
Buxaresta Romanyayê



## 32. Pênc bingehên dilşadiyê

### ***I. Bihurek e dinya, bêziyan jê bibihure***

Bihurek e dinya û her ruhber jê dibihure;  
bêqusûrî tenê kar û barê Xwedê ye,  
her tişt dembihur e, dê bibihure,  
Tu ji destkeftiyên xwe çêjê wergire  
û bi ibretê ji têkçûnan bibihure!

### ***II. Berpirsiyariyan çendbare ke***

Paqijkirina gildîn û gemarê karê te be heke  
bi carekê ve neweste, raneweste û çendbare ke;  
ji her carê coş û peroşiyekê wergire, xwe egle neke,  
bi heman coşa pêşîn eynî tiştî di eynî wextî de dubare ke.

### ***III. Destkeftiyên xwe dêrz neke***

Çirav dibin dilop û dilop vedigerin qurteke avê;  
tu mîna dinyanedîtîyan û tezedîtîyan nede navê,  
destkeftiyên xwe biparêze bi rijdî bivê-nevê  
û dêrz neke saman û serweta ku tê bi xwihdan û ravê.

### ***IV. Xwe û xwezayê nas bike***

Gava te xwe û xweza nas kir, tu yê wan biparêzî jî;  
gava te Xwedê nas kir, tu yê bi yektayiya wî biperêsi jî.  
Heke dihizirî, berawird dikî û dixebitînî mêjî,  
tu yê fêr bibî ku hertim diqede temen û jî;  
wisan e, çi pêwist e kedera ji bo derdên kavîjî  
wisan e, çi pêwist e kesera ji bo tasewasên kelevajî.

### ***V. Bi qasî taqeta xwe barpiştan rake***

Bar ne giran in, lê serbar piştşikên in;  
pišta xwe bi serbaran kul neke birayê min,  
bi qasî pêja carekê teştta xwe tijî ke xweha min,  
bi qasî berika xwe lingên xwe dirêj kin kulfetê min,  
û li gorî budceya xwe mezaxtinê bike gelê min.

Bihurek e dinya, bêziyan jê bibihurin gidîno!  
Bi heman coşê berpirsiyariyan çendbare kin merîno!

Lehî hertim qurman nayîne, destkeftiyan dêrz nekin hevalno!  
Kî xwe û xwezayê nas bike, Xwedayê xwe jî nas dike hogirno!  
Bi qasî taqeta xwe barpiştan rakin,  
bi qasî xurê meriyekî asayî bixwin  
ne bi qasî ku hûrê gayekî tijî kin.

20.09.2023; 23:23  
Buxaresta Romanyayê



### 33. Felsefeya jiyânê (werger ji Îlya Ebû Madî)

Gazindaro, derdê te çî ye ku bi gilî-gazinan vedireşî;  
Tu yê çawan vê riyê bimeşî, dema ku wiha nexweş î?

Tawanbarê herî nebaş ew kes e ku ditirse ji meşînê  
dema ku amadekariyan dike ji bo rêwîtî û çûyînê.

Gava ku pîjekî dibîne ser bistê gulê, jê vedikişê;  
nabîne wê xunava tacdar a ku li ser gulê dinişê.

Xeyda giran a li ser stûyê jiyânê ye ew kesê han;  
ew nekesê ku jiyânê dide naskirin wekî barê giran.

Ewê ku kesayeta wî ji bedewiyan rût û repal e,  
ji her tiştê li ser rûkalê erdê re dibêje çepel e.

Delîl li halê wî rebenî be ku jiyânê tehl dihesibîne  
Hew dizane ku qe tehm û çêjeke xweş tê de nîne

Hişmendên herî jîr û zana yên vê jiyânê ew kes in:  
ewên ku nirxekî didin tehlahiyê û wateyê xweş dikin.

Çî çaxa ku şahî bi dest te ket, kêfê jê wergire;  
heta ku neqede, netirse ku ew ê ji dest te here

Gava mija kederekê raweşiya fêza serê te  
da ku temendirêj nebe, li ser neaxive zêde

Haya balindeyên çol û pesaran jî bi vê heye;  
cihê şermê ye ku agehiya te ji vê yekê tune.

Ma tu nabînî ku xwediyê zeviyê ye kesekî din;  
dîsan jî ew tê de hildikevin-dadikevin û dinivin?

Balinde distrên û eyloyî li esmên serwerî kiriye;  
nêçîrvanan jî xwe telandiye û çav li nêçîrê ye.

Dîsan jî distrên, gava dibînin ku hinek bi zindîtî  
tên girtin, hinekên din jî diweşin erdê bi mirîtî.

Ew distrên, her çiqas umrê wan kêmtir salekê ye;  
qey bigiriyana û bigotana ecelê wan negihîştîye?

Ew geh dinişin erdê heban berhev dikan;  
geh jî boçikên peraş li dû xwe kaş dikan.

Gava çiqilên daran bêtevger radiwestin;  
ew lê siwar dibin û wan bervejêr dadixin.

Gava asoya berêvaran zêrav dikan çiyayan;  
ew jî li ser çiqilan dinişin û dua dikan berêvaran.

Tu jî çav bide balindeyan, bigere li kêf û şahiyê,  
wekî ku ew jî di navrojê de digere li sîwan û siyê;

Hezkirina surîştê fêr bibe ji balindeyên esmên;  
gotegotan paşguh bike, bila deng ji wan neyên.

Kesê ku xwe ji rexneya rexnegiran diparêze,  
ji her kesî cureyekî rexne û lomeyê dibihîze.

Ji destpêkê heta dawiyê xurê wê xweliyê yî;  
ha tê de mîr î, ha tê de bêrûmet û bende yî.

Tu ruhber li bin konê esmên sermedî namîne;  
çima mirov li pey tiştê nebûyî, nedîtî dikudîne?

Her stêrk winda dibe ji ber çavan bi avabûnê;  
lê karesata stêrkê ew e ku bitirse ji xuricînê.

Serencama gulê ya li gulistanekê çilmisîn e;  
bi hişmendî bibezê, ji bo wê xwe biçilmisîne.

Gava te li ser rûkalê erdê sîwanek peyda kir;  
jê sûd wergire, heta bi aliyekî din ve çerx kir.

Gava esmên rûyê xwe pirçî kir, baranê bipê;  
ew ê bibare li deştê û bi baranê vejîne deştê.

Bibêje civaka ku hêsiran bervejêr digindirînin:  
“We bi girî çendî çend kul û derd derman kirin?”

Em nehatine vê jîyanê ku renc û azarê bikêşin;  
gelî aqilmendan, hûn jî xwedîaqilan bihêvojin.

Çi kesê ku xem û kederan li paşîlê kom dike,  
jana kederê wî digire û ji binçirkê ve radike.

Bibe bilbil û şalûla ku distrê li ser hêlîna xwe;  
di qeyd û qefesê de jî nabire xweşdengê xwe.

Nebe qijika ku li erdê kêz-kurmikan dişopîne;  
nebe kundê şeveder ku li wêraneyan dilorîne.

Bibe çemê ku rewneq rewneq dikişe li erdê;  
ji her du rexan ve digihêje zeviyan, avê didê.

Çemê ku stêrk tê de soberiyê dîkin û her kes  
û her tişt wêneyê xwe tê de dibîne bi hewes.

Tu derdankek nikare qeyd û zeft bike avê;  
Heta ku ew av bi xwe tê de vegere çiravê.

Berbangan bibe bayekî ku çiçekan dibişkivîne;  
geh xwar bê û bêhn bike geh bi lêvan ramûsîne.

Nebe jehreyê ku palaxa berpalan dihejîne  
û bi şev tirs û wêlewêlê li rûyê erdê diweşîne.

Bi şev bibe stêrkeke gerok, biçe gelek serdanan;  
bikeve galegalê digel çem, çiya, deşt û daristanan.

Nebe tarîbaneke ku ji gerdûn û mirovan kerixiye;  
yekcar seza dike, perde bi ser giştan de daxistiye.

Gazindaro, bi rastî derd, kul û keserên te tunene;  
Bi xwe qenc û rind be, dorhêla xwe bedew bibîne.

*21.09.2023; 22:27*  
*Buxaresta Romanyayê*

